
# ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



30
1991

## NAVEROK


Jı Xwendevanan.................................................... 3
Lı Iraqê Rojnamegeriya Kurdi/2- Heme Salıh Ferhad.................................................... 4
"Mırov" dı felsefa Cegerxwûn da - Gundi.................. 8
Du Helbest, Du Stran - Keremê Anqosi..................... 11
Bı Seid GEBARİ ra hevpeyvin.......................................... 12
Lı Swêdê perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki radıbe?.................................................... 14
Zeviya Zıman-Çend gotın lı ser pırtûkên Zarokan - X. Lezgin.................................................... 16
Helbest - Rızaliyê Reşid.................................................... 20
Deranin - Berevkar: A. Bazidi.......................................... 21
Berevoka Terman.................................................... 23
Cıvina nıviskar û hunermendên Kurd - Elmanya.... 24
Lı Ser "Jiyana Kurdan" pêşangehek - Ferhan/........ 25
Xelata taybeti ya "Cıvis 90" gıhişte welatparêza kurd Senem'ê-Gulçina Sisık/Elmanya...................... 26
Pêkeni - Bavê Alan.................................................... 27
Çirok : "Gur û Pirê" - Tolstoy. Werger: Azad Nûbar 28
Daxuyani jı bo Pressê.................................................... 30
Weşanên Nû.................................................... 31



**Sal: 12**
**Hejmar: 73, Çıleya Paşin 1991**

ISSN 0283-5355

**XWEDİ:** KOMKAR-Swêd
**BERPIRSİYAR:** Şêroyê BOTAN
**NAVNİŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM
**TELEFON :** 08/ 26 23 75
**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska Arbetarföreningen
**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş. BOTAN
**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 STOCKHOLM
**FAX:** 08/ 26 23 75

# Jı Xwendevanan

Hezar caran piroz dıkım, kovara Roja Nû!
Bıla destê wan nıviskara sax be ku, xebata zımanê me bı cih anine. Hurmeta mın jı hemû zımanan ra heye, lê zımanê me beri hemiya ye, lı ba me. Pêwist e ku nıviskarên me zıman pêşda bıbın û bıparêzın. Zıman maye dı destê me da, ku ew ji here, em dıbın gunehkar. Dıjmın welatê me bıriye, xêr û bera wê dıxwe. Kultura me ji dıziye, kıriye a xwe, lê gıran dıbine ku yek galgal û gotınekê bı Kurdi bêje û bine ser zımanê xwe.


Kes nıkare me jı zımanê me bı dûr bıke, bı taybeti lı dervayi welat.. Lê mıxabın ez dıbinım ku, pırê keç û xortên me ne bı zımanê dayika xwe dıpeyivın. Ew pê şerm dıkın, û xwe pê pıçûk dıbinın. Bı taybeti xelkê Kurdıstana Bakur, ku çavê hemû parçên dın lı wan e. Zımanê me dewlemend e, bêhtır jı yên Tırk, Farıs û Ereb, dema em xwe jê ra bıkın xwedi..

Hezar rehmet lı ser gorê wan be û hemû şehidên Kurdıstanê be; Kamran û Celadet Bedırxan, ku beri 60-70 sali ev zıman parastın û bı tipên latini pêşda bırın. Dûra ji rehmeti Doktor Nûredin Zaza û Nûri Dêrsımi hınek parastın. Û nıha ji kovara Roja Nû bı vi kari ve rabûye, hezar hezar car piroz be û destê nıviskarên tê da nerızın.

**Hesen El-Malla (Bavê Kamran)**
Bonn, 5/12/1990

**Jı xwendevanan ra:**
Dı hejmara 29. da, dı rûpelê 3. û 27. da, bı şaşi, dı şûna "Terminoloji" da, termoloji û termonogi hatiye nıvisandın.
Em vê şaşiyê lı vır serast dıkın û hêvidar ın ku xwendevan lı me bıborinın.
Redaksiyona Roja nû

## "BEFIR BARİ"



Jı bo stranbêjê mezın Mıhemed Arıf Cıziri..

Befır bari
Zıvıstana heştê şeşê
Zıvıstaneka reş û dırêj
Befır û baran
Her dem barin
Sartır j'befırê
Gotın barin
Ketın derê hemi mala
Jê ra gotın
L'baxçê hunerê me kurda
J'hemya dara b'xemıl bıri
Lisê şalul û bılbıla
Nê bılbılê şeyda fıri
Tembûreka nızme-bıha
Ma bê xudan
Têlê bı perde kır gıri
Her pênç kenarêt warê me
Dengek veda
Geli û çiya lêk vegêra
"Lê lê dinê..
Lawkê sıwara..
Xezal Xezal...Aminayê..
Gıdyana... Eyşana Eli..
Zozaniyê... Babê Şukri
Alayê me kurda zer e..
Welatê me Kurdıstan e..
Xıraba... Kewa mınê... Dıla.."
Gaziya mırınê belave kır
Taziya Gıran.. cergê me da..
Her dê bıminıt
Lê fırıtın helm û gori
Lê mıxabın
Dıbêjın CIZİRİ'yê mıri
Dıbêjın CIZİRİ'yê mıri.

**S. Amedi**

**Têbıni:**
Ev helbesta han jı bo hozanê diyar, jı bo gıyanê pak ê stranbêjê bı nav û deng Mıhemed Arıf CIZİRİ hatiye çêkırın.
Bı helkeftına borina çar sala ser rawestana dılê Cıziri ku çûye ber dılovaniya Xwedê.

# LI IRAQÊ ROJNAMEGERİYA KURDİ /2

HEME SALIH FERHAD

**PERWERDE Û ZANISTİ :** Sê mehan carekê derketiye, kovareke perwerdegari û ılmi bûye. Jı aliyê rêxıstına perwerdeyi ya Kurdi bı zımanê Erebi û Kurdi lı Bexdayê çap bûye. Hejmara ewlin dı sala 1971'an da, hejmara dawin û ya 17'an ji dı sala 1980 da derketiye.

**BELAVKIRAWEYİ RIVANGE** (Belavkırına Nezer an ji Nıhêrinê) : Jı aliyê edebiyatvanên nûjen, wext bı wext lı Bexdayê hatiye weşandın. Serhev sê hejmar derketiye. Hejmara pêşin dı sala 1971'an da çap bûye.

**BIRAYETİ :** Parça Kurdi ya rojnama siyasi Etlahi ye. Bı Kurdi hatiye weşandın û organa P.D.K. Iraqê bûye. Lı Bexdayê heftê carekê derketiye. Xwediyê rojnamê Hebib Mıhemed Kerim, sernıviskar ji Dara Tewfiq bûye. Dı 26'ê meha Gulana sala 1972'an da hejmara pêşin derketiye.

**ETLAHİ :** Organa P.D.K.-I, bı zımanê Erebi lı Bexdayê wek rojnameyeke rojane hatiye weşandın. Hejmara ewlin dı 29'ê meha Avrêlê ya sala 1967'an da derçûye. Dı meha Çıriya Paşin ya sala 1968'an da hatiye qedexe kırın. Paşê dı 4'ê meha Gulana sala 1970'an da disa dest bı weşanê kıriye û heta sala 1974'an 1585 hejmar derketiye, pıştra disa hatiye qedexe kırın. Pıştı 2 salan disa derketiye.

**BİRİ NÛ :** Rojnama hefteyi ya çandi ye. Jı aliyê Fexri Kerim Zengene va hatiye derxıstın. Sernıviskar Dr. Hûsên Qasım Eziz bûye, û lı Bexdayê çap bûye. Dı nabeyna 17'ê meha Hezirana sala 1972 heta Adara 1978'an weşana xwe domandiye. Ev rojname Kurdi, parçeki rojnama Erebi ya Elfıkır bûye.

**GIZING (Zereqiya Tavê) :** Kovara edebi ye û jı aliyê Yekitiya Nıviskarên Kurdıstan-şaxa Kerkûkê, hatiye weşandın. Berpırsiyar, Rıza Şıvan bûye û hejmara pêşin dı sala 1972 meha Avrêlê da der çûye.

**NÛSERİ NÛ (Nıviskarê Nû) :** Jı aliyê Yekitiya Nıviskarên Kurdıstan-şaxa Hewlêrê, hatiye weşandın. Gelek berhemên edebi yên kêrhati tê da cih gırtıne. Hejmara pêşin dı meha Hezirana 1972'an, ya dawin û ya 5'an ji dı sala 1980 meha İlonê da hatine weşandın.

**HOŞYARİ KIRÊKARAN (Hışyariya Karkeran) :** Jı aliyê Yekitiya Gıştì ya Karkerên Iraqê va hatiye weşandın. Kovareke hefteyi ye û bı zımanê Erebi û Kurdi derketiye. Bı Kurdi hejmara pêşin dı 7'ê meha Çıleya Pêşin ya sala 1972'an da derketiye û rojname ser hev 189 hejmar derketiye.

**ROŞINBİR (Ronakbir) :** Cıvata Ronakbirên Kurd-şaxa Hewlêrê ev kovara çandi weşandiye. Sernıviskar Abdulrezzaq Betûşi, berpırsiyar ji Ehmed Şerif bûye. Dı meha Avrêla sala 1973'an da hejmara pêşin çap bûye.

**BIRAYETİ :** Rojnama siyasi ya rojane ye. Lı Bexdayê derketiye, xwediyê wê Hebib Mıhemed Kerim, sernıviskar Dara Tewfiq e. Hejmara yekemin dı yekê meha Çıleya Paşin ya sala 1974'an da derketiye. 25 hejmar derketiye. Hejmara dawin dı sala 1974'an meha Sıbatê çap bûye.

## KOVAR Û ROJNAMEYÊN KU EMIR-DIRÊJ BÛNE

**JİYAN :** Rojnameya cıvaki, edebi û siyasi

bûye û heftê carekê derketiye. Bı rêz xwediyê rojnamê Hûsên Nazım û helbestvanê mezın Piremêrd bûne û lı Sılêmaniyê çap kırıne. 553 hejmar derketıne.

**JİN** : Kovara kulturi ye. Bı rêz xwedi û berpırsiyariya kovarê van kesan kırıne: Piremêrd, Cemil Sayeb, Nûri Emin Mehmûd, şaırê gewre Goran û Ehmed Zirek. Lı Sılêmaniyê çap bûye. Lı gora nıviskaran, berdewama Rojnama Jiyan bûye. Hejmara pêşin ku lı ser hejmara 554 hatiye nıvisin, dı sala 1939'an meha Çıleya Paşin da derketiye, heta sala 1963'an bı dırêjahi weşana xwe domandiye.

**GELAWÊJ** (Meha Tebax an ji navê stêrkeki) : Kovara mehane ya edebiyatê ye. Xwediyê wê İbrahim Ehmed, berpırsiyar ji Elladin Seccadi ye. Hejmara pêşin lı Bexdayê, dı sala 1939 meha Çıleya Pêşin da hatiye çap kırın. Heta Tebaxa sala 1949'an 105 hejmar hatiye weşandın.

**BEYAN** : Kovara huner û edebiyatê bûye û mehê carekê der çûye. Ewıli jı aliyê Wezareta Agahdariya Iraqê, paşê jı aliyê Saziya Çand û Belavkırına Çanda Kurdan hatiye weşandın. Jı seri heta dawiyê dı bın berpırsiyariya Dr. Ekrem Fazıl da bûye û lı Bexdayê çap bûye. Dı meha Çıriya Paşin ya sala 1979'an da hejmara yekemin derketiye, hejmara 141'an ku ya dawiyê bûye, dı sala 1949 meha Adarê da hatiye weşandın.

**HEVKARİ** : Ewıli jı aliyê Darulcemahir. ... ... paşê ji jı aliyê Saziya Çand û Belavkırına Çanda Kurdan hatiye weşandın. Hejmara pêşin 9'ê Çıleya Paşin sala 1970'an da çap bûye. Heta 14'ê meha Avrêla sala 1988'an 966 hejmar derketiye.

**ROJİ KURDISTAN** : Kovara kulturi ya gışti ye. Jı aliyê Komela Çanda Kurdan derdıkeve. Hejmara yekemin dı sala 1971 meha Hezirané da çap bûye û heta nıha ji weşana xwe dıdomine.

**KORİ ZANYARİ KURD - KORİ ZANYARİ IRAQ** (Akademiya Ilmi ya Kurd û Iraq) : Dema ewılin jı aliyê Akademiya Ilmi ya kurd dıhate derxıstın. Hejmara pêşin lı Bexdayê dı sala 1973'an da çap bû. Wext bı wext derdıkeve. Nıha jı aliyê Akademiya Ilmi ya Iraqê-Beşa Kurdi tê derxıstın. (Çend hejmar hatiye weşandın, jı ali nıviskar va nehatiye diyarkırın).

**ROŞİNBİRİ NÛ** (Ronakbirên Nû) : Kovara çand û edebiyatê ye û lı Bexdayê çap bûye. Ewıli jı aliyê Rêxıstına Gışti ya Saziya Perwerdeyi bı zımanê Kurdi hatiye weşandın, paşê jı ali Saziya Belavkırına Çand û Belavkırına Çanda kurdan hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı 11'ê meha Çıriya Paşin a sala 1973'an da çap bûye Dı demên salê da wek kovarek lêkolini çap bûye û hêj ji weşana xwe dıdomine.

**OTONOMİ** : Ev kovar lı Hewlêrê jı aliyê Meclisa Navça Kurdıstanê bı zımanê Kurdi û Erebi tê weşandın. Dawiya sala 1975'an da dest pê kır, heta sala 1988 58 hejmar derket.

## WEŞANÊN EMIR-KIN

**PEYJE** (Pêlekan) : Kovara cıvaki û edebi ye, jı aliyê Mıstefa Şewqi lı Bexdayê hatiye weşandın. Hejmara pêşin û ya axırin dı sala 1927'an da hatiye weşandın.

**ZANISTİ (Ilm)** : Kovara 15 roji ya edebiyat û dirokê ye. Xwedi, Salıh Qeftan e û lı Sılêmaniyê çap bûye. Hejmara ewıl û ya paşin dı 25'ê meha Sıbata sala 1938'an da çap bûye.

"Weşanên emırkın xên jı yên ku me lı jorê behs kır, gelek kovar û rojname ji hatıne weşandın. Qısmek lı beşa rêxıstınên siyasi û demokratik, ya saziyên perwerdeyi û şexsan me cih dabû. Qısmek ji jı aliyê mamostan, xwendevanan û saziyên perwerdeyi hatıne derxıstın, em ê lı pêş ji behsa wana bıkın."

## WEŞANÊN KU JI ALİYÊ MAMOSTEYAN HATINE DERXISTIN

**HEWLÊR** : Jı aliyê komela Mamostên Hewlêrê bı Kurdi û Erebi der çûye. Kovareke hefteyi, cıvaki û çandi bûye. Hejmara pêşin dı sala 1950 16'ê meha Çıleya Pêşin da çap bûye. Heta 27'ê meha Çıleya Pêşin a sala 1953'an weşana xwe domandiye.

**BILÊSE (Alav)** : Kovara edebiyat û cıvaki ya mehane ye. Lı Sılêmaniyê jı aliyê Cıvata Mamostên Sılêmaniyê va dı sala 1959'an meha Tebaxê da hejmara pêşin der çûye. Hejmara dehan û ya dawiyê ji dı sala 1960'an da derketiye.

**DENGÊ MAMOSTE** : Kovara çandi û perwerdeyi ya mehane ye. Jı aliyê Yekitiya Mamosteyên Kurdıstanê-Beşa Sılêmaniyê va dı meha Sıbata sala 1971'an da hatiye weşandın. Heta sala 1973'an weşana xwe domandiye.

**HÊVİ** : Jı aliyê Yekitiya Mamosteyên Kurdıstanê-Beşa Dıhokê va, lı bajarê Dıhokê der çûye. Kovareke mehane ye. Çend hejmar derketiye, hejmara pêşin dı sala 1971'an da hatiye weşandın.

**BO PÊŞEVE** : Cıvata Mamosteyên Kurdıstanê-Beşa Hewlêr, lı bajarê Hewlêr hatiye weşandın. 2 hejmar der çûye, hejmara ewılin dı sala 1973'an meha Sıbatê da hatiye weşandın.

**AMANC** : Ev kovar jı aliyê Sekreteriya Yekitiya Mamosteyên Kurdıstanê va lı Bexdayê hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı meha Çıleya Pêşin a sala 1974'an da derketiye û çend hejmar hatiye weşandın.

## WEŞANÊN KU JI ALİYÊ XWENDEKARAN HATINE DERXISTIN

**DENGÊ QUTABYAN** (Dengê Xwendekaran) : Jı aliyê Yekitiya Xwendevanên Iraqê, lı Bexdayê hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı sala 1959'an da derketiye û 4 hejmar hatiye weşandın.

**DENGÊ QUTABYAN** : Kovara çandi, jı aliyê Yekitiya Xwendekaran Iraqê-Beşa Kerkûkê bı zımanê Kurdi, Tırki û Erebi hatiye weşandın. Hejmara ewılin dı sala 1959'an da derket û tenê 3 hejmar hatıne weşandın.

**HİWAYİ KURDISTAN** : Kovara edebi, cıvaki ya xwendekaran ye. Jı aliyê Yekitiya Xwendekarên Sılêmaniyê, lı vi bajari hatiye weşandın. Hejmara pêşin meha Çıriya Paşin sala 1959'an da, ya dawiyê ango hejmara 13'an ji dı sala 1960'an 19'ê meha Çıriya Pêşin hatiye weşandın.

**GIZING** : Ev ji jı aliyê Yekitiya Xwendekarên Sılêmaniyê hatiye weşandın. Kovareke cıvaki, edebi bûye. Hejmara pêşin lı bajarê Sılêmaniyê dı sala 1959'an da hatiye weşandın.

**JİYAN** : Kovara xwendekarên bûye. Jı aliyê Yekitiya Xwendekarên Iraqê-Beşa Hewlêrê hatiye weşandın. Dı sala 1960 meha Çıriya Paşin da hejmara pêşin, dı sala 1961'an da ji hejmara dawi hatiye weşandın.

**XEBATİ QUTABYAN** : Wext bı wext jı aliyê Sekreteriya Yekitiya Xwendekarên Kurdıstanê va, lı Bexdayê bı zımanê Kurdi û Erebi wek kovarek xwendekaran hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı sala 1970'an da hate weşandın û çend hejmar derket.

## WEŞANÊN KU JI ALİYÊ DIBISTANAN Û SAZİYÊN PERWERDEYİ HATINE DERXISTIN

**NIŞTİMAN** : Lı bajarê Sılêmaniyê jı aliyê Dıbıstana GORAN, wek kovareke ılmi û edebi hatiye weşandın. Hejmareke wê tenê dı sala 1959'an meha Adarê da weşiyaye.

**HUNER** : Lı Sılêmaniyê jı aliyê Mekteba Sınetên Destan, wek kovareke huneri hatiye weşandın. Usa diyar e ku tenê hejmarek dı sala 1959'an da çap bûye.

**RÊBER** : Kovara perwerdeyi ya xwendekaran e. Jı aliyê Dıbıstana GORAN hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı meha Avrêla 1966'an da, ya dawiyê dı sala 1968'an da hatiye weşandın.

**GIZING - ÇİYA** : Ev kovar ji jı aliyê Dıbıstana Goran hatiye weşandın. Hejmara ewıli bı navê Gızıng dı sala 1967'an da, hejmara duduyan û ya dawiyê ji bı navê Çiya dı sala 1968'an da hatiye weşandın.

**TİŞK (Çırûsk)** : Jı aliyê Mekteba Ma-

mosteyan a Hewlêrê, salê carek hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı sala 1969'an da ya dawiyê û ya duduyan ji dı sala 1970 da hatine weşandınê.

**RIHÊLE** : Lı Hewlêrê jı aliyê Dıbıstana Goran wek kovareke perwerdeyi û çandi, salê carek hatiye çap kırın. Hejmara pêşin bı vi navi hejmara duduyan, û ku ya dawiyê ye, bı navê "Biri Nû" dı sala 1972 da hatiye weşandın. (hejmara pêşin ji dı sala 1971 da çap bûye).

**KOLECİ EDEBİYAT** (Koleja Edebiyatê) : Jı aliyê Zaningeha Bexdayê beşa Koleja Edebiyatê, wek kovareke ılmi û akademik bı zımanê Kurdi, Erebi û İngılizi hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı sala 1972, ya axırin û hejmara 23'an ji dı sala 1079'an da çap bûye.

**BEREV RONAHİ** : Jı aliyê mekteba navin ya bı navê Gelale Goran we kovareki edebi û çandi lı Gelaleyê hatiye weşandın. Hejmara ewılin dı sala 1972 da, ya axırin û ya sısêyan ji dı sala 1973'an da hatiye çap kırın.

**ZANKO (Zaningeh)** : Kovara ılmi ye û jı aliyê Zaningeha Sılêmaniyê hatiye weşandın. Bı zımanê Erebi, Kurdi û İngılizi çap bûye. Hejmara pêşin dı sala 1975'an da derketiye. Dı cilda heştan da û bı hejmara duduyan, dı sala 1981 da weşana xwe sekınand.

**GULALE** : Kovara xwendekaran e û jı aliyê Zaningeha Sılêmaniyê hatiye weşandın. Bı zımanê Kurdi û Erebi derketiye. Hejmara pêşin dı sala 1976'an da derketiye. 77 salên xwendınê hatiye weşandın.

**ASOYİ ZANKO** (Bergeha Zaningehê) : Jı aliyê Zaningeha Sılêmaniyê wek kovarek çandi bı zımanê Kurdi û Erebi hatiye derxıstın. Hejmara pêşin dı sala 1977'an da derketiye.

## ROJNAME Û KOVARÊN ZAROKAN

**ESTÊRE (Stêrk)** : Wek parçeyek kovara Roji Kurdıstan lı bajarê Sılêmaniyê derketiye. Hejmara pêşin dı havina sala 1972 da derketiye.

**ESTÊRE** : Kovara mehane ya zarokan e. Jı aliyê Rêvebıriya Gıştı ya Saziya Çanda Kurd lı Bexdayê hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı sala 1975'an meha Gulanê da çap bûye û tenê du hejmar derketiye.

## ROJNAMEYÊN KU BI DESTAN HATINE NIVİSANDIN Û WEŞANDIN

Vana dı wan çaxan da lı hember qedexeyên hukım, bı dest hatıne nıvisin û belavkırınê. Merıv dıkare bêje, ku ew niv-aşkere û niv-veşari bûne. Dı wan deman da navê ku em bıkarıbın behs bıkın û yê ku navdar e, Mamoste Şakır Fettah e. Wan çaxan dı nehiyên Hurmal, Qadır Keremê da ew serwêr bûye. Disa lı qeza Çemçalê ji qeymeqami kıriye.

**BASERE** (navê cih-wareki ye) : Jı aliyê Şakır Fettah lı Qadır Keremê ev rojname hejmara xwe ya pêşin dı 25'ê meha Hezirana 1942'an da weşandiye. 24 hejmar derketiye. Hejmara axırin dı sala 1942'an 23'ê meha Çıriya Paşin hatiye weşandın.

**HURMAL** (nehiyeki lı kurdıstana Iraqê ye) : Jı aliyê Şakır Fettah, bı destan hatiye nıvisin û belavkırınê. Hejmara pêşin dı 3'yê meha Hezirana 1940'an da, hejmara 24'an û ya dawiyê dı 24'ê meha İlona 1940'an da hatiye weşandın.

**ÇEMÇEMAL** (qezaki nêzi Kerkûkê) : Rojnameya hefteyi û diroki ye. Ev ji bı destan hatiye nıvisin. Disa jı aliyê Şakır Fettah va lı Çemçemalê hatiye weşandın. Hejmara pêşin dı sala 1946 meha Tirmehê da, hejmara dawin ku ya 7'an bûye, dı 12'ê meha Tebaxa 1956'an da derketiye.

Şakır Fettah, xên jı rojnameyên ku me navê wan lı jorê da lı bajarê Aqrê bı navê AQRE, bı zımanê Erebi disa rojnameyek derxıst. Dı mabeyna 15.7.1950 -15.9.1950 da mamoste Şakır Yusıf ev xebat wergerande ser zımanê Kurdi û dı sala 1984'an da çap kır.

DAWİ

# "Mırov" dı felsefa Cegerxûn da

GUNDİ

Dı nıvîsarên Cegerxûn da "mırov" ciheki taybeti standiye. Dı vê gotarê da em dıxwazın "mırovê" Cegerxûn bıdın ber ronahiyê, da ku em zanıbın ev mırova ki ye û çı ye? Jiyan û ramanên wi çava ne? Xwastekên wi jı xwe û jı hemdemên xwe çı ne? Ev mırova çawa lı dıwaroj temaşe dıke? Ew çawa hebûn û tunebûnê dıbine? "Qeda û qeder" an ol û olperesti bı ditına wi çawa ne?

Xwendevan bersivên van pırsên han û gelek bersivên di (dın) dı nıvisarên Cegerxûn da dıbinın. Lewra em ne şaş ın, gava em dıbêjın: "Felsefa Cegerxûn". Em Cegerxûn beri her tışti wek helbestvan û nıviskar dınasın, lê dema em




FOTO: ROJA NÛ

nıvisar û helbestên Cegerxûn û şêweyê jiyana wi dıdın ber çavên xwe, em lı pêşiya xwe felsefeka jı her ali da avakıri dıbinın.

Em bawer ın, ku neweyên (nıfş) dıwarojê wê Cegerxûn ne tenê wek helbestvan û nıviskar lê belê ew ê wi wek filosof ji bınasın. Jı ber ku, eger em bıxwazın bersiveke kurt bıdın pırsa "felsefe çı ye?", em ê kanıbın bêjın: Felsefe ditına mırov e dı jiyanê da.

Dı hemû bergehên diroka mırovaniyê da wısa bû, ku her û her mırovan xwastıne der dorên xwa nas bıkın û pırs jı xwe kırıne û ber xwe dane, ku bersivan jı van pırsan ra bıbinın. Ev zaninên han jı neweyekê dıgıhên neweyeka di. Bı vi awayi êdi ew dı cıvakê da kom dıbın û her dıherin bêtır dıbın.

Eger disa em jı xwe bıpırsın: "Gelo dı çı demê da felsefe peyda bû?" Bê guman bersiv ew e, ku felsefe bı peydabûna mırovan ra peyda bû. Bı vê ditınê mırov û felsefe jı hevdu nayên cudakırın. Bı gotıneke dın, her mırovek dı dema xwe da filosofek e, û felsefe ne tenê berhema bir û baweriya mırovên zana ye. Ew dı jiyana cıvaki da peyda bû û peyda dıbe. Felsefe hebû, beri ku mırov navê wê bıkın felsefe. Em kanın vê gotına Yunani bı gotına "evindariya zaninê" wergerinın zımanê Kurdi. Mırovên ku dı warê zanina tevayi da bêtır kar dıkırın û kar dıkın, nav lê bûn yan lê dıbın filosof. Wan mırovan, "filosofan" kanıbûn zanin û ditınên xwe kom kın ser hev û jı hemdemên xwe û jı neweyên dın ra bıkın rêçeka ramani.

Wısa dı her demekê da filosof hebûn, jı ber ku mırov hebûn. Lê belê bı pêşketına abori û zanısti û bı peydabûna gund û bajaran yan komelên mırovani êdi raman hatın nıvisandın û wek nıvişt û nıvisar ketın destên mırovan, û bı vi şêweyi navên mırovên zana jı demên wan derbas bûn û nola (wek) hemû beşên çand û zaninê ketın diroka mırovaniyê.

Pışti van çend gotınên tevayi em vegerın ser felsefa Cegerxûn û pırsên me lı pêş hıldane. Dı vır da em ê bı nımûnan vê felsefê diyar bıkın.

Dı hemû helbest û nıvisarên xwe da Cegerxûn lı ser pırsên jiyanê yên bıngehin sekıniye, lê dı diwana "ZEND-AVISTA" da bı şêweki bernameyi ev pırsên han dane pey hev. Lewra em ê nımûnan bo vê gotarê tenê jı vê diwanê bıstinın.

Cegerxûn dıxwaze mırovê xwe çavvekıri be, zana be, dı dema xwe da bıji û lı dıwarojê temaşeke. Jiyana mırovan, jiyana cıvaki, bûye hestiyê pışta nıvisarên Cegerxûn. Gotınên wek jın û mêr, xort û keç, karker û cotkar, gel û netew, welat û cihan bûne stûnên helbestên Cegerxûn. Dı helbesta "Ol û Daxwaza Mın"(1) da dıbêje:

Jı dıl guh bıdera mın ey bıra
Jı bo te bıhûnım dır û gewhera

Dıxwazım bıbêjım bı rast û dırıst
Bere bêne ser mın hezar kurt û pıst

Şiyarbın, lı kar bın weki pehlewan
Bıxwênın, bıbênın çiye ev cihan?

Jı destpêkê da helbestên Cegerxûn bona hışyarkırın û rızgarkırınê ne. Ew gotınên xwe weke dur û gewheran dıbine û bı rasti û dırısti pêşkêşi xwendevanên xwe dıke. Ew dıxwaze em şiyar bın weki pehlewanan kar bıkın, bıxûnın, da ku em cihanê nas bıkın.

Cihan rengê bûke, çı şêrin jıne
Bızanın qelen, xurti û xwendıne (2)

Bo xurti û xwendınê Cegerxûn bı hezaran car ban kıriye, ku bı hev ra em ser xwe, destên xwe em têxın destên hev û em xwe jı zordariyê û bındestiyê rızgar bıkın bo jiyaneka wekhevi dı nav şahi û dılxweşiyê da.

Tu rêzan be carek siyaset bıxwin
Bı vê xwendınê rêçıka xwe bıbin

Bıbe jir û zana dı her çax û dem
Jı ser me tu rake çı zor û setem (3)

Jı ber ku gelê Kurd her car dı warê siyasi da ketiye û dı warê xwendın û zanıstên nûjen da lı paş maye, lewra Cegerxûn xwastiye em siyasetê bıxûnın û bı fıkır û raman, bı zanin û hunermendi zor û seteme jı ser gelê xwe rakın. Bo vê yekê pêwist e her mırovek dı vi kari da beşdar be. Eger jın lı mal danêşın, ev kara nivçe dımine. Cegerxûn jı zû da deng lı jınan ji kıriye bo hışyarbûnê, zaninê, pêşketınê û jı bo tevger û xabetê ji.

Jınê rabe serxwe, tu destan vemal
Tu rextan gırêde lı bejna delal
***
Bı taktik û bir û bı can û bı dıl
Bı hevre herın pêş hemi mıl bı mıl

Ne ko şer dıxwazın, ne ji hırç û hov
Dıxwazın bıjin em weki hev mırov
***
Tu hozan û rêzan be ey xuşka can
Bı te xweş dıbın ev hebûn û cihan

Ez û tu jı hev hatıne wek hevın
Lı pey hev dıçın em, çı roj û şevın (4)

Cegerxûn lı her derê gotiye, em şer naxwazın, bımrın şer û ceng, lê tenê xebat çêdıbe jı bo jiyaneka xweş dı serbestiyê da. Her wısa bona serxwebûnê ji Cegerxûn dıbêje:

Bıra zanıbe pır xweşe serxwebûn
Bı destê weye hatın û tev hebûn

Eger em ne jirbin û dest nedne hev
Nıkarın gırêkê vekın em bı dev (5)

Bê guman em kanın bêjın Cegerxûn helbetvanê serxwebûn û rızgariyê ye. Wi tım gotiye em xûnê bırıjinın bo serxwebûna Kurdıstanê, em welatê xwe derxın jı bın destên Tırk û Ereb û Farısan, bıla her gelek dı qada xwe da serfıraz bıji. Êdi ev xûnrıjandına ne jı bo xûnrıjandınê ye û ne ji jı bona êrişvani û destdırêjiyê ye, ev jı bo dıwarojeka bı rûmet e bo me û bo mırovaniyê tevda. Armanca Cegerxûn bıratiyeka rast e dı cihaneka azad da, cihaneka bê sinor û pasaport.

Tu serbest bıji pır xweşe ev jiyan
Ne tenha ez û tu, belê tev cihan
***
Tu kara xwe pêşkêş bıke bo hemi
Bıra û mırovın hemi ademi (6)

Cegerxûn cudabûn nexıstiye nav mırovan, nav gelan, nav nıjad û rengan, lê wi diwarên bılınd navbera zordestan û bındestan ditıne û bê rawestan xwastiye, ku bındest xwe rızgar bıkın.

Heçi mıletın tevde wek hev bızan
Bıke ceng û şer tım lı hember dızan

Mırovi, bırati, ne xewn û derew
Weki hev dıjin tev çı ev û çı ew
***
Setemkare carek xwedi mal û gund
Çı Kurd û çı Turk û çı Japon û Hınd (7)

Bı dılêşi û keserên kûr Cegerxûn dı helbesta "Rewşa Kurdıstan" (8) da nıvisandiye dıbêje:

Lı rewşa xwe meyze bıkın, xwendewar
Ne qade, ne ave, ne zêre, ne war

Ne rûmet jı bo me maye, ey heval
Bı dili me derbaskırın mah û sal
***
Çı rewşek perişane em tê dıjin
Xem û derd û dili lı ser me rıjin

Dı bın destê dıjmın dıjin rengê hov
Nızanım ko kengi dıbın wek mırov?
***
Weha têne kuştın bı destê neyar
Ne rûmet, ne dewlet, perişan û jar

Bı rasti ferhenga jiyana Kurd dı sedsala bistan da dagırtiye bı bêjeyên wek kuştın, lêdan, êriş, zor, setem, qamçi, zindan, dil, reben, perişan, belengaz... Ev e jiyana gelê Kurd dı vê demê da. Cegerxûn ji dı vê rewşê da jiyana xwe derbas kır, lê mamosteyê mezın, weke gelê xwe, seri tucaran lı ber zordariyê danexıst û bı jiyana bındestiyê û perişaniyê qayil nebû.

Cegerxûn wek mıroveki zana û birewer zagonên jiyanê baş naskırıbû; bı ditıneka diyalektiki lı tıştan temaşe dıkır û daye xuyakırın, ku her tışt têne guhartın û lıv û tevger nasekının û nayên sekınandın. Wi dı her rewş û pergalê da ew zagonê tevgerê ditıye, çı dı cıvakê da û çı dı xwerıskê da. Yek jı encamên vê tevgerê ew e, ku tıştên teze zora tıştên kevın dıbın û cihên wan dıstinın, lê ew ji pıştı demekê kevın dıbın û her wısa her tışt pêşva dıçın yan tên guhartın.

Dı nav kevn û nûde heye ceng û şer
Heçi kevne hawır xwe kırye çeper

Belam nû bı êriş dıçi ser kevın
Tenê zû bı zû ji kevın narevın

Lı ber xwe dıdın ew çı gernas û xurt
Tenê herçi tıştên kevın jinê kurt

Nıkarın lı ber xwe bıdın ta bı her
Heçi hışke dımri, dıjin şin û ter

Belam herçi nû ji dıbın kevn û kal
Dı serve dıborın hınek mah û sal

Yeki di jı nûve wesan tête ser
Jı ci derdıxi lê bı ceng û (bı) şer (9)

Dı jiyana xwe ya bı rûmet da Cegerxûn gelek mırov, gelek bir û baweri û ol ji naskırın. Dı nav xwendın û lêkolina kûr da ew gıhişte pır encamên ramani û cıvaki. Wi dit, ku her olek xwe çêtır dıbine û yên di qebûl nake. Dı vi wari da ji Seyda ramanên xwe aşkere û raste-rast avêtıne meydanê û xwe jı olperestiyê rızgar kıriye.

Mebe olperest ey hevalê delal
Bı her kesre rast û dırıst be heval
***
Çı tıştê neqenc bi şerê wi bıke
Heçi qence herdem tu her wi bıke

Nebe dostê xwar û peyayê neyar
Tımi dost û yar be jı bo ê hejar
***
Heçi tıştê pake dı her ol û din
Bıhûne, bırêse, jı bo me werin (10)

Dı dawiya vê gotarê da em dıxwazın bêjın, mıxabın ku rewşa me ya netewi wısa dıjwar e, ku em nıkanın çand û zımanê xwe baş pêşva bıbın. Lêkolina zanısti bı destê me nakeve, lewra pır tıştên me hên (hêj) dı tariyê da mane. Wısa bo nıvisarên Seyda ji, hın jı wan hên çap nebûne û neketıne destê xwendevanan û hın ji çap bûne lê bı zanısti lêkolin lı wan nebûne. Ev gotara, bê guman, tenê dılopeke jı derya Cegerxûnê mamoste, rêber, birewer û zana.

Tıştê zor lı xweşiya mırov tê, ku helbestvanê me yi mezın dı vê sedsalê da rola xwe ya diroki baş naskırıbû û bı bihneka fıreh û bı ditıneka dûr karê xwe bê rawestan pêşva dıbır. Perwerdekar û mamostê neweyên me tım bo xwendevanan nıvisandiye û bı wan ra deng kıriye û gotiye, bı ya mın bıkın û vaye rê.

Derê vê nıviştê tu carek veke
Tu rewşa me iro jı bira meke

Eger baş te ditın bıbê aferin
Eger tışteki kêm heye jê derin
***
Dıbêjım ko rojek nebên kes nebû
Weyan Kurd dı her demde bê kohne bû (11)

Wısa Seyda şireta lı me dıke û zanin û rasti û felsefa jiyanê ya mırovani, ya rındiyê, ya xêr û xweşiyê dıde pêşiya me.

Neqenci û qenci bı destê mene
Ku herdu dı laşê yekide hene
***
Bıra guh mede gotınên pır nebaş

>>>>

# DU HELBEST DU STRAN

**LÊXIN BIRANO LÊXIN**

Ax, Kurdıstan ez hatım te bıbinım,
Hê tu keti şer, ax lı mın, te nabinım.
Gelo kengê Kurdıstan wê aza be,
Erdê Kurdê şervanê jir, zana be.

**Lêxın bırano, lêxın,**
**Roja sor bılınd e,**
**Kurdıstana aza,**
**Çıqas xweş û rınd e.**

Eva dınya bê Kurdıstan xweli ye,
İro roja şer e tune çare ye,
Rabın lêxın dıjmın ser me bari ye,
Derdê Kurda, xemê gelek sali ye.

Bese bınal dılbırino Kurdıstan,
Jı xwina bılbıl tu sor bûyi Gulıstan,
Êyy Kurdno mertalê me yekiti ye,
Riya azadiyê iro pêşmergeti ye.

**WELAT**

Ez heyrana ditına te me,
Hay welat, can welat, hay welat, welat
Qurbana xweşroja te me
Hay welat, can welat, hay welat, welat

**Em bir nakın gulıstanê**
**Em ê herıne Kurdıstanê**

Bê welati rasti zor e
Hay welat, can welat, hay welat, welat
Merıv bındest, stuxwar, kor e
Hay welat, can welat, hay welat, welat

Welat hılbet xweş û rınd e
Hay welat, can welat, hay welat, welat
Merıv bı wê serbılınd e
Hay welat, can welat, hay welat, welat.

**Keremê ANQOSİ**


>>

Hınek pır lı pêşın, hınek pır lı paş
***
Jı her tıştê başre dılê xwe veke
Heçi ko nebaşe dûri xwe ke (12)

**Berlina Rojava, 1989**

**Têbını:**

(1) Hemû nımûne jı "Zend-Avısta"ne. Rûp: 37-39
(2) Rûp: 37-39
(3) Rûp: 55-56
(4) Rûp: 42-48
(5) Rûp: 49-54
(6) Rûp: 59-62
(7) Rûp: 87-97
(8) Rûp: 110-113
(9) Rûp: 87-97
(10) Rûp: 120-132
(11) Rûp: 95
(12) Rûp: 96



# *Bı* SEİD GEBARİ *ra hevpeyvin*

PIRS: Jı kerema xwe ra tu dıkari bı kurti behsa jiyana xwe jı xwendevanên Roja Nû ra bıki?

BERSİV: Ez dı sala 1956'an da hatıme dınyayê. Em lı gund dıman. Hin ez zarok bûm nexweşi kete nav mıllet. Wan çaxan kes nıkarıbû bıçe ser dıxtor. Jı ber bêdermani, hejari û sedemên dın. Gelek kes mırın, seqet man. Mın çavên xwe wısa wında kır. Nık me (lı ba me) dıbêjın Çavkulbûna Payizê. Vê nexweşiyê heta sala 1966-67'an pêsira mın berneda û tu ji çawa dıbini, ez qet nabinım.

Mın hin dı heşt saliya xwe da dest bı stranan kır, heta nıha ji her hunerên xwe dıdominım. Dı sala 1971'i da dest bı siyasetê kır, bı gotıneke dın pıştı destxıstına heqê Kurdan a 11'ê Avdarê dı nav P.D.K. Iraqê da mın dest bı xebata siyasi ji kır. Heta sala 1977'an ez pêşmerge bûm. Heft sal dı beşa agahdari û propagandayê da mın kar kır. Jı cotyar û paleyan ra mın seminer dıda. Mın hım dı mıntıqa Behdinan, hım ji dı mıntıqa Soran da karê xwe dımeşand. Dı sê şerê mezın da bı bılındgoyê mın halan da pêşmergeyan, ruhiyeta wana bılınd kır. Du caran ketıme keminan û bırindar bûm.

PIRS: Kengê te dest bı muzikê kır?

BERSİV: Dı 1970 da mın dest pê kır. Ez bı Erebi û Farısi ji dıkarım bıstırêm. Lê dı cıvinan da na. Çawa mın lı jor got, jı ber nexweşiyê û korbûnê mın pırtır xwe da ser stranbêjiyê. Berê mın bê tembûr dıgot, paşê dest bı tembûrê kır. Vê taliyê mın jı ber destê mamostên heja ders gırt. Wek Dr. Şemal Sahıb, Tahır Tewfiq û Eli Merdan. Her sê ji bı rasti hostayên muzika Kurdi bûn.

Gelek tesira Tahır Tewfiq lı ser mın heye. Dı mıqamên Kurdi da bêtır dengê wi ber bı çiyayên Kurdıstanê dıçû û bı rasti stran bı zanısti dıgotın. Mıxabın ku par çû ser dılovaniya xwe.

Pêşiyê mın bı tembûra Kurdi dest pê kır. Nıha hemû aletên muzikê yên Kurdi lêdıxım. Wek ûd, keman, bızıq (Kurdê Iraq û Sûriyê lêdıxın. 4 têlê wê, û lı ser hev 32 perdê wê hene.) Bı ûdê tenê awazên nû derdıxım. Dı cıvin û şevan da Bızıqê lêdıxım.

PIRS: Stranên ku tu dıstırêyi, helbestên kê nın?

BERSİV: Berê mın ên seydayê Cigerxwin û Tirêj (jı Kurdên Sûriyê ye. Bı qasi 5-6 pırtûk helbestên wi henın, jı ber feqiriyê nıkare çap bıke) dıxwend. Jı sala 1982'an vırda ez bı xwe dınıvisım û bı awazê jı ber xwe derxısti va dıstırêm. Hınek henın mın notayên wan ji çê kıriye. Tu dê bêji te çawa kıriye? Rast e, mamostên mın lı jor behsa wana kır hini mın kırıbûn. Dema ez hazır dıkım, gazi hevalên ku jı notayê fehm dıkın, dıkım. Ez dıbêjım, ew ji dınıvisın. Nıha bı qasi 3 pırtûk helbestên mın henın. Lê hınek helbestên mın henın ku nabın nota. Wek kılamên dırêj ên serhati, ewana her wısa dıminın (1)

PIRS: Ev kılamên te, dı hın rojname, kovaran da, yan ji wek pırtûk hatıne belav kırın?

BERSİV: Berê lı Hewlêrê bı uslûbeke nehini mın dı kovara "Hevkari" da dınıvisi. Dı kovara "Metin" da her tım koşeki pêşmergan hebû û belav dıkır. Lı ser edebiyata Kurdi ji mın

dınıvisi.

Heke heval alikari bıkın, ez dıxwazım û jı wana hêvi dıkım ku jı nû va wan wek pırtûkeki çap bıkım.

PIRS: Wısa diyare ku tu dıxwazi bı komekê ra tevayi muzikê çê bıki. Lı gor ditına te kara xebateke weha çı ye?

BERSİV: Wek hemû kar berhemên bı tevayi bên çêkırın, jı yên dın hin baştır ın. Destên tenê deng jê nayê. Jı ber vi yekê ez dıxwazım bı grûbeki ra bıxebıtım, tevi keç û lawan, ew ên ku ez dızanım fêri wana bıkım. Bı vi awayi em jı bo Kurdan ji kareki baş çê bıkın. Hêvidar ım ew ên ku meyla wana henın, xwe bıdın ber vi kari.

PIRS: Lı gor te muzika Kurdi iro dı kijan qonaxi da ye? Muzik û muzikvanên Kurdıstana Iraqê jı parçên dın pêştatır tên xuyan, sedemê wê çı ye?

BERSİV: Me Kurdên Iraqê Mamosteyên gewre (mezın) hebûn. Jı sala 1930 vırda, wek Tahır Tewfiq, Eli Merdan, Reşwal Evdılla, dengbêjê mezın Hesen Zirek dewreke mezın listın bo pêşdabırına muzik û muzikvanan. Nıha wek mamoste DILŞAD, dı Rojhılatê da kesê ku yekemin lı kemanê lêdıxe ew e. Bı Tehsin Taha ra Koroya Dıhok, Koroya Jınên Kurd û Koroya Hewlêrê saz kırın. Pışti beyana 11'ê Avdarê fırsendek baş kete destê muzikvanên Kurd. Mamosteyek dın ji, Enwer Qeredaxi ye ku ew ji baştırin kemanê lêdıxe. Mamosteyên me gelek jı yên cinaran pêşta ne. Lê belê cih tune ye, fersend nadıne wana ku dewrê xwe bıbinın. Yê wana mekteb, medrese, pere û pûl henın, dewlet alikariya wana dıke. Wek ez bêjım Rızgar Xoşnav xelkê Hewlêrê, hostayê ûdê ye. Mıxabın bê xwedi ye. Nıha lı Avûstûryayê dımine, bı taybeti bı Nasır Rezazi ra carna dıxebıte. Dı Kurdıstana İranê da Mezher Xalıqi, pışti Hesen Zirek tê. Disa hostayê çak İqbal heye. Heke fesal bıkeve dest muzikvanên Kurd dıkarın bıgıhijıne tanga mıletên dın.

PIRS: Bernama te jı bo pêşedemê çı ye?

BERSİV: Destê mın vebe, ez gelek tıştan dıxwazım bıkım. Helbest û operatên mın, dı destê mın da henın. Alikariya mın bıkın, bo Kurdan dıkarım gelek tıştan çê bıkım. Derdên Kurdan bıgıhinıne gelên dınyayê û gelek dostan peyda bıkın. Pır tışt ji henın mın bı xwe ra dernexıstiye dervayi welat. Heke fırsend bıbinım ez ê wana ji binıme vıra. Heke heval hebın ez dıkarım alikari bo tiyatrovanan bıkım. Çı jı aliyê muziki, çı jı aliyê metelok û hıkyat gotınê va. Mın ev kara pêk dıani, dema ku ez lı Hewlêrê bûm.

PIRS: Helbesteke te ya ku te kıriye stran, dıkari jı me ra bıdi nıvisandın?

BERSİV: Ez dı zindanê da bûm, pireka mın ji gırtın, keça mın 3 sali bû. Zindana jınan lı pêşberi ya mêran bû. Carekê mın dengê jına xwe bıhist ku bı keçıka mın ra dıpeyivi., dengê xwe bılınd dıkır ku ez ji bızanıbım ku ew ji hatiye gırtın. Mın ji helbesta jêrin nıvisi:

*Dilbera mın, gırtiya destê neyar û kedxur e,*
*Gırtiya zindana tari, bê deri û bê pencere,*
*Dimen û cıwani veşartın, nahêlın rohni bıde,*
*Jı lev ku hetava jiyanê bê buha û reng zer e.*

*Ev gula ku hılm û bihn e ya mın e gırtiye neyar,*
*Kırıne çar parçe bı dest xwe jı hev kırıne pışk û par,*
*Wan dı nêv da şahi ye lê Kurd hejar û bendewar*
*Nêrgıza çiyaki Metina destê dıjmın raser e.*

*Şireta gelê mın e ku bımırın em nerevın,*
*Çina pale û cotyaran em ê nêzik serkevın,*
*Newiyê Sımko û Xanê Dımdım ın Kurd her ev ın,*
*Gel xudanê kevnetor û maf û bir û bawer.*

PIRS: Jı bo xwendevanên Roja Nû dıxwazi tışteki dın bıbêji?

BERSİV: Hêviya serketınên xwendevanên Roja Nû dıkım. Bıla dengê Roja Nû bı bergeh û xurttır bıbe dı nav mıletê me da. Gelê me, dı warê edebi û çand ji hin fırehtır dıvê em bıdın nasin. Bê şık evi karê bı rûmet kovara Roja Nû bı rê va dıbe. Serketına Kurdan û ROJA NÛ bı dıl û can dıxwazım. Spas!

**Têbıni:**

*(1) Mın gelek stranên folklori jı dengbêjên bê tembûr, hin dı zaroktiya xwe da stand. Ewana medreseyên stranbêjên wê demê ne.*

## Lı Swêdê

# Perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki radıbe?



ANN ERIKSSON/SIGMA

Swêd welatê yekemin e, ku jı sala 1976'an şûnda, jı bıyaniyan ra mafê xwendına zımanê zıkmaki lı dıbıstanan, wek mafeki mırovi û demokratik pejırandiye. Lê wısa xuya dıke ku nıha ev siyaseta demokratik û comerd şûna xwe dıde siyaseta asimilekırıneke bı lez...

Hukumata Swêdê, isal dı pakêta xwe ya krizê da -wek gelek mafên ekonomik û demokratik- kurtısandına mafê perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki ji daye ber xwe. Lı gor pêşniyarên hukumatê, pêwist e çûyin û mesrefên perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki, jı isal pêda % 50 kêmtır bıbe. Ango dı carekê da nivê imkanan jı holê bête rakırın.

Sedem ji ev e, lı gor raporên ku jı aliyê pısporên hukumatê va hatıne amadekırın: "Perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki, geleki bı mesref e (bıha ye) û ne efektif e."

Lı gor pêşniyaran û hın bıryarên ku jı nıha va derbasi praktikê dıbın, perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki, pışti zemaneki ne dûr, jı dıbıstanan tê rakırın. Herçend ew pêşniyar raste-rast behsa rakırına zımanê zıkmaki nakın ji, lê dı encamê da bı xwe ra rakırına vi mafi tinın.

Çend pêşniyar û bıryarên hukumetê weha nın:

*Pêşniyar*

* Dersên zımanê zıkmaki, dıvê pışti saetên dıbıstanê yên rojane, ango lı dervayi şema normal bên dayin.

*Pêşniyar*

* Taxên ku zarokên biyaniyan lê kêm ın, perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki dıqede. Lı taxên ku biyani pır lê hene, zarokên çend dıbıstanan dê lı dıbıstaneki kom bıbın û dersa zımanê zıkmaki bıstinın. Bı vi awayi hejmara mamostan ji kêm dıbe, mesref ji..

* Lı gor bıryareke dawiyê, perwerde û hinkırına zımanê zıkmaki dewri belediyan dıbe. Hukumat dı vi wari da berpırsiyariyê jı ser xwe davêje. Belediye û mudurên dıbıstanan xwedi bıryar ın; imkanan çıqasi bıdın, çıqasi nedın ew bı kêfa xwe ne.. Ev bıryar jı nıha va derbasi praktikê dıbe.

Çawa tê xuyan, dı vê guhartınê da, siyaseteke şareza û durûtiyeke mezın heye. Ew baş pê dızanın ku pışti dıbıstanê, zarok dıxwazın herın bı hevalên xwe ra bıleyizın, yan ji bı sporekê va mıjûl bıbın. Zarok naxwazın hemû wextê xwe bıdın dıbıstanê.

Belê ev têrê nake, dıvê zarok herın lı dıbıstaneke dın kom bıbın û lı wır dersa zımanê zıkmaki bıstinın.

## Dıvê em lı hember vê guhartınê bêdeng neminın



Jı bo zarokan materiyalên dersên bı zımanê Kurdi roj bı roj zêde dıbın.

Çawa tê zanin, cara pêşin lı vi welati dı dıbıstanan da zarokên me gıhiştın mafê xwendına zımanê Kurdi. Û hina nû kurdan dest pêkırıne jı bo zarokên dıbıstanê materyalên dersên Kurdi derdıxın. Nıha tecrûbê û zanina mamosteyên Kurd bêtır çêbûye. Lı gor çend sal berê, ew iro çêtır dıkarın, pêwistiyên karê mamostetiyê binın cih. Bı kurti mırov dıkare bêje, dı gel gelek kêmasiyan, pêşketıneke berbıçav xuya dıke. Hêvi ew e ku, tecrûbe û materyalên ku lı vi welati çê dıbın, feyda wan bıgıhije kurdên lı welatên dın ji.

Lê mıxabın nıha hukumata Swêdê gelek rêyan dıcerıbine ku vi mafi jı destê me û jı destê hemû biyaniyan paşda bıstine. Bê guman ev pêşniyar û guhartınên nû, jı her ali va anti demokratik ın.

Eger hemû dê û bav, komele û rêxıstınên biyaniyan bı hevra, bı tundi lı dıji van guhartınên nû derkevın; bı xurti dengê xwe bıdın bıhistın, hıngê dıkarın pêşiyê lı wan bıgrın. Bêdengi yan ji tunebûna tevgereke grûbên biyani lı dıji vê yekê, wê cesaretê bıde wan, ku iro "kêm" bıkın, sıbê ji "tune" bıkın.

Xasıma jı bo me kurdan ev pırs, pırseke geleki gıring e. Dıvê em lı hember vê guhartınê bêdeng neminın. Bona vê, pêwist e dê û bav, mamoste, komele û hemû Kurdên xwedi berpırsiyari dı bın rêberiya Federasyonê da dengê xwe bıkın yek û nerazibûna xwe bı awaki xurt nişani hukumatê bıdın.

Lı ser vê pırsê, Federasyona Komelên Kurdıstanê lı Swêdê belavokek weşand. Dı belavokê da, jı bo hevkariyê bangi dê û bav, rêxıstın û hemû kesên Kurd dıke. Em hêvidar ın ku ew dı vi wari da hın gavên pêşdatır bavêje.

Roja Nû ji lı ser vê pırsê jı hukumata Swêdê ra ev nameya jêrin şand.

□

Jı Hukumata Swêdê ra,

Em, kêmkırına imkanên jı bo hinkırın û perwerdekırına biyaniyan protesto dıkın.

Baweriya me ew e ku, mafê her zarokeki heye ku zımanê xwe yê zıkmaki lı dıbıstanê û dı nav çarçova şema rojane da, pêşda bıbe. Ev baweri, jı sala 1976'an heta nıha baweriya hukumata Swêdê ji bû. Tewrên hukumatên Swêdê dı vi wari da, heta iro demokratik û mırovi bû. Lê nıha plan û pêşniyarên hukumatê lı ser wê meylê ne ku, ew paşda gavekê bavêje. Ev yek çawa hemû grûbên biyani, wısan ji (û bı taybeti) me Kurdan xemgin û acız dıke. Cara pêşin lı vi welati zarokên me mecala xwendına zımanê zıkmaki ditın. Ev mecala lı vır, hındık be ji, jı bo me gıranbıha ye. Jı ber ku wek hûn ji pê dızanın em geleki bı 30 milyoni, bê dewlet; welatê wi koloniyeke navnetewi, jı mafê xwendın û nıvisandına zımanê xwe û hetta qısekırına zımanê xwe mehrûm ın.

Lı aliyê dın, izolekırına perwerde û hinkırına biyaniyan jı xebatên dıbıstanê yên mayin, wê bıbe sedem ku, gelek şagırtên ku hewceyi alikaryê ne, dest jı dıbıstanê û xwendınê berdın.

Pêwist e hukumata Swêdê evê rastiyê lı ber çavan bıgre û dı şûna kêmkırına imkanên heyi da, bêtır imkanan bıde xebata perwerde û hinkırına zarokên biyaniyan.

Bı sılavên germin

21.12.1990 Stockholm

**Redaksiyona Roja Nû** (Kovara çandi ya Kurdi)

# ZEVÎYA ZIMAN

LÊKOLÎN, RAMAN, REXNE, PÊŞNÎYAR..

# ÇEND GOTIN LI SER PIRTÛKÊN ZAROKAN

X.Lezgîn



Lı Swêdê jı aliyê Weşanxana Çanda Kurdi va gelek pırtûkên zarokan, jı zımanê Swêdi hatıne wergerandın û çapkırın. Pıraniya wan jı aliyê Reşo Zilan va hatıne wergerandın. Dı literatûra zarokan da - Lı Swêdê- ev pırtûk yên bıjare ne. Nıviskar û wênekêşên wana kesên bı nav û deng ın û geleki tên hezkırın. Ew gışk ji bı wêneyên rengin ın; dı hêla çap, grafik û kaliteya materiyalên van pırtûkan da mırov nıkare qala tu kêmasiyeki bıke. Destê amadekar, wergêr û çapgêrên WÇK (Weşanxana Çanda Kurdi) sax be ku wan bı van weşanan literatûra zarokên Kurd dewlemend kırıne. Hewce nine mırov dûr û dırêj behsa pêwistiya literatûra Kurdi ya jı bo zarokan bıke. Dı vi wari da walahiyeke pır mezın heye û lı ber çavan e... Lê pêwist e, ew kıl û kêmasiyên ku dı vê xebata hêja da çêdıbın bên diyarkırın ku ew careke dın - dı çapkırıneke nû da, yan ji dı xebatên nû da, dernekevın pêşiya xwendevanên pıçûk. Bı taybeti dı pırtûkên weha da, ku bı her ali va qaliteya wan bılınd ın, û mesrefên çapkırına wan ji herwısa gıran ın..

Jı zûva mın dıl hebû ku ez lı ser zımanê van pırtûkan û lı ser hın şaşi û kêmasiyên ku dı wan da hene, bala wergêr û berpırsiyarên weşanxanê bıkışinım. Her çıqas dı edebiyata me da, rexneyê hina cihê xwe yê hêja û pêwist negırtıbe ji, lê dıvê êdi em xwe fêri rexne-gırtın û rexne-bıhistınê bıkın. Bêguman dıvê rexne jı bo çêkırın û serastkırınê be, ne jı bo xırabkırın û hılşandınê!..

Bı vê baweriyê ez lı vır dıxwazım hın xeleti û kêmasiyên van weşanan (bı taybeti jı ber ku ew pırtûkên zaroka nın) diyar bıkım. Vê yekê ne tenê pêwist, lê herweha jı xwe ra wek wezifekê dıbinım. Û hêvidar ım, hevalên ku ew amade kırıne û weşandıne, van rexneyan dı vê çarçovê da bıbinın. Jı xwe ev nıvis, dı eyni wextê da, wê bıbe goftugoyeke pıçûk lı ser hın pırsên zımanê me yê nıvisandınê bı gışti.

## Çıma xwendına wan dıjwar e?

Dıvê ez bêjım, ku ev pırtûkana herçendi jı van aliyên xwe va (ku me lı jorê behs kır) materiyalên baş ın ji, lê xwendına wan, ne ewqasi hêsan e. Jı ber ku zımanê wan (yê pıraniya wan..) gıran e, ne sade û sıvık e, ku zarok bı hêsani bıxwinın û jê fehm bıkın. Xeletiyên tashihê ji serbariser.. Gelek caran zarok (û mezın ji..) wan bı hewas hıldıgrın ku bıxwinın, lê jı ber gıranbûna zıman û xeletiyan, hewasa wan a xwendınê dıreve.

Beri ku ez hın şaşi û kêmasiyan bı nımûneyên wan va bıdım xuyan, dıxwazım sê (3) sedemên sereke yên çêbûna van şaşi û kêmasiyan û gıranbûna zıman bıdım xuyan:

1- Beri her tışti nuhbûna edebiyata nıviski ya jı bo zarokan, ku dı edebiyata Kurdi da xwe hina wek embiryon nişan dıde. Ango dı vi wari da tunebûna kevneşopi û tecruban... Herweha pırsgırêkên zımanê me yê nıvisandınê bı gışti.

2- Basit- gırtın û hıneki ji bêxemiya çapxanê, sedemeki dın ê gıring e. Bêşık wek me lı jorê ji gotıbû, tenê derxıstına van pırtûkan bı serê xwe kareki hêja û wezifeyeke berbıçav e, ku WÇK pê va rabûye. Lê dı hêla şêwe û metodê amadekırına van pırtûkan da bêxemi û basitgırtına vi kari xwe diyar dıke. Jı ber ku:

a- Xeletiyên tashihê gelek ın. (Gerçi dı pırtûkên dawin da kêm bûne, lê disan ji pır ın.)

b- Derheqa gıranbûn û dıjwarbûna xwendına van pırtûkan da, bıli zarokan, dê û bav û mamosteyên Kurdi ji gazınan dıkın, û - ez bawer dıkım, berpırsiyarên weşanxanê ji bı vê yekê agahdar ın. Lê wan çıma bo sıvıkkırına xwendına van weşanan tevdirên pêwist nestandıne gelo? Madem imkana derxıstına van pırtûkan heye lı vi welati, dıvê bı awayê heri baş jê bête istifadekırın.

Dıbe ku derbari pırtûkên zarokan da, fıkra "Tıştek nabe, ma ne jı bo zarokan e.." hatıbe pejırandın.. Yan ji pır derxıstına pırtûkan, jı pır rastbûn û tekûzbûna wan (dı hêla zıman û rastnıvisandınê da) çêtır û pêwisttır hatiye pejırandın... Sedem çı dıbe bıla bıbe, xeletiyên tashihê dı pırtûkên zarokan da dıvê qet çênebın. Yan ji heta jı dest tê, mırov wana kêm bıke. Riya vê ji ew e ku, beriya çapkırınê, redaksiyon yan ji çend kesên jêhati pırtûkê hûrgıli bıxwinın û kêmasi û şaşiyên wê serast bıkın. Tevdireke dın a baş ji ew e ku, pırtûkekê du kesên cuda wergeninın û paşê binın ba hev û wan rûberi hevdu bıkın, û jê alternatifên çêtır wergırın. Xebateke weha kollektiv dı navbera wergêran da, wê encameke çêtır bıde. Dı proja xwe da, weşanxane dıkare bı vi awayi bıgıhije encama heri baş.

3- Şêwe û dıjwariyên wergerandınê û xeletiyên mina van nımûneyên jêrin.

Bêşık karê wergerandınê kareki ewqasi hêsan nine. Bı taybeti dema ku mırov jı zımaneki pêşketi , wergerine zımaneki wek zımanê Kurdi, ku hina gelek pırsên xwe yên bıngehin çareser nekıriye; û wek zımaneki pexşanê (nıvisa nesir) ji geleki nû ye. Lê ev ji nayê wê meneyê, ku mırov karê wergerandınê bıhêle pêşerojê, heta kengê ku zımanê me yê nıvisandınê, rınd gıhişt û bû zımaneki kemıli yê edebiyatê...

Na! . Bêguman bı zımaneki, çıqasi pır pexşan bête nıvisandın, ew ewqasi pêşdıkeve. Bıla ew pexşan werger be ji.. Ango bı wergerê ji zımanê nıvisandınê pêşdıkeve. Jı xwe dı zımaneki jindar da, bıvê-nevê werger wê hebe. Lê helbet normên wergerandınê hene û pêwist e wergêr xwe lı wan bıgre. Dı wergerandınê da norm çı ne, çı ninın, ez yeko-yeko lı ser nasekınım. Jı ber ku ev babet jı çarçova nıvisê der e. Lê bı kurti ez dıkarım bêjım ku, mırov dıvê ne hewl bıde nıvisê peyv bı peyv wergerine, ne ji zêde serbest wergerine. Dıvê wergêr jı stila nıviskar dûrnekeve. Mena vê çi ye, dı pırtûkên zarokan da?

## Stil, zımanê zarokan, zımanê mezınan...

Stil (uslûb), hılbıjartın an ji tercihkırına yek jı imkanên ifadekırınê ye. İmkanên ifadekırınê jı bo mezınan gelek ın. Ew dıkarın bı gelek uslûban bıpeyvın û bınvisın. Mezın dıkarın dı her rewşekê da, bı awayeki mebesta xwe pêşkêş bıkın. Mezınek dıkare dı şinekê da bı awayeki, dı şayiyekê da bı awayeki dın qıse bıke. Dıkare nameyeke evinê (eşqê) bınıvise. Dıkare dı cıvineke siyasi da, siyasetê qıse bıke û ew dıkare bı zarokên pıçûk ra qıse bıke. Ango mezın dıkare "bı mezınan ra bıbe mezın, bı pıçûkan ra bıbe pıçûk".

Lê jı bo zarokan ne wısa ye. Wek tê zanin, zarok bı zımanê xwe yê qısekırınê, yê rojane va gırêdayi ne. Lı ba zarokan, çarçova azadiya tevgera stilistik teng e. Ev çarçove, dı salên dıbıstanê da, bı wextê ra fıreh dıbe. Peydakırın yan ji fırehkırına meydana stilistik, beri hertışti kareki hindekariyê ye. Lı dıbıstanan, yek jı wezifeyên dersdaran e ku, ew dı vi wari da zarokan bıgıhinın.

Nıviskarên zarokan -yên baş..- , dı uslûba xwe da, hertım sewiya zarokan lı ber çavan dıgrın. Jı zımanê zarokan ê rojane zêde dûr nakevın. Dı wergerê da ji dıvê ev tışt lı ber çavan bête gırtın.

Nımûne:

1. "Bextê te bı te ra yar e"= 2. "Şansê teheye"
(jı pırtûka "Tuan") (alternativ)

Dı zımanê qısekırınê yê rojane da, zarok jı van herdu ifadeyan ya (2.) bêtır dıbıhisın û dıxebıtinın. Lema ji xwendın, û dı cih da jê fehmkırına hevoka (2.), hısantır e jı bo zarokan. Dı hêla sintaksê (rıstesazi; avakırın, yan ji hûnandına hevokê) da ji, zımanê zarokan jı yê mezınan cuda ye. Mesela hevokên zarokan kurttır ın. Hevoka (1.) hım dırêj e, hım ji dı şûna yekê da du peyvên asmani (abstrak, soyut) hene: "bext" û "yar". Gelo çend zarokên 8-9 sali dıbêjın "Bextê te bı te ra yar e." ?

Nımûne:

(1) "Jineke rehet û jı xem, kul û kovanan bı dûr bı xwe ra radıkışandıbû"

(2) "Kendalên bılınd yên, bêi terk û bêi qelş, bêi kun û bêi qul, jı jor da dadıketın jêr." (jı pırtûka "Kela Jinê")

Dı herdu hevokên jorê da, peyvên yekmane (sinonim) wek: xem, kul û kovan, terk û qelş, kun û qul, lı pey hev hatıne rêzkırın. Belê, dı zımanê me da, peyvên dûhev (yên ku bı hevra tên gotın) hene. Wek: "çıl û çiya", "xem û xeyal", "sal û zeman", "derd û kul" û hwd. Di-san dı zımanê me da, hın caran peyveke biyani dı gel yeke Kurdi, jı bo xurtkırına maneyê tê bıkaranin. Lê wek dı van nımûneyên jorin da, peyvên ku meneyên wana yek ın, ne tenê dı zımanê zarokan da, lê dı zımanê mezınan da ji zêde lı dû hev nayên gotın.

Jı xwe zarok, bı qasi mezınan peyvên cure-cureyi bı kar naynın, û ew hevokên xwe ji kurt ava dıkın. İcar dı eyni meneyê da, gotına sê peyvên cuda lı pey hev, jı zımanê zarokan hı-neki dûr e...

Dı kurdiya van pırtûkan da, mırov lı gelek ci-han rasti nımûneyên dırûvdayi tê.

## Jı du pırtûkan çend nımûne (bı şırovekırınên kurt):

Hejmara pırtûkên zarokan, yên ku Weşanxana Çanda Kurdi heta nıha weşandıne, jı bisti zê-detır e. Mın pıraniya wan xwendiye û şeş heb ji wana, bı orijinalê wan va da ber hev. Xele-tiyên ku mena gotın û hevokên orijinalê gu-hartıbın (bıli çend heban.Wek nımûneyên (14) û (25), lı jêrê ), ez rast lê nehatım. Hın jı wana geleki baş ji hatıne wergerandın. Lê, wek me lı jorê ji got, dı Kurdiya wan da, hılbıjartına pey-vên ne dı cih da; xeletiyên tashihê, xeletiyên rêzmani û ferhengi ne hındık ın. Lı jêrê, hın xeletiyên bı vi cureyi hatıne tesbit kırın.

Mın tenê jı du pırtûkan nımûne hılbıjartın: 1- Kela Jinê, Veronica Leon. 2- Tuan, Eva Bo-holm- Olsson û Pham Van Don.

### "Kela Jinê"

(1)- "Ewreke berfê"

Zayenda "Ewr" nêr e. Wek tê zanin, dı Kur-manci da navên hemû tıştên ku bı ezman (asi-man) va gırêdayi ne, mê ne. Lê "ba" û "ewr" ne tê da. Ango dıvê "ewreki berfê" be.

(2)- "Deri jı nû ve heya dawin vebû."

Peyva "dawin" rengdêr e, ne nav e. Nav "dawi" ye, paşpırtıka "n" wê dıke rengdêr. Ras-tiya hevokê weha ye: "Deri jı nû ve heya da-wiyê vebû"

(3)- "Kurê malê yê sısiyan lı ber êşika deri xuya kır"

"Êşik" peyveke Tırki ye, ku dı Kurdi da jê ra "şêmik", "şêmûk", yan ji "sipane" tê gotın.

(4)- "Pısmir dı wi baweriyê da bû."

"Baweri" mê ye. Lema dı şûna "wi" da, dıvê "wê" bête gotın.

(6)- "Wi jı xwe re pêti û alavên kuçıka lı koşê dınıhêri."

Lêkera "nıhêrin", daçeka "lı" dıxwaze. Pêwist e lı pêşiya "pêti" "lı" bête nıvisandın.

(7) "Dı vê navê de Ba xwe hêdi hêdi daxıst.."

Dı hevokê da, pêwist e kırde (subje) lı gor grup û forma lêkerê - ku transitif û dema bori ye- bête tewandın (dekline kırın).

(8) "Bakurê Rojava cakêteke spi derêxıst û avit mılê Pısmir."

"Çakêt" nêr e û fonema seri /Ç/ ye. Ango "çakêteki spi" rast e.

(9) "...... wê berê hiç guleke holê spehi ne-dıtıbû."

Dı nav sinonimên "holê, wısa (usa), wılo, wer, weha" da, ya ku lap kêm tê gotın, "holê" ye. Ew bêtır dı mena "nav", "meydan" da tê gotın. Çêtır e, eger ew sinonimên ku pıraniya xelkê dızanın, bên xebıtandın.

(10) "Dı mılê wê de qufıkek hebû".

Peyva "qufık" bı bınyata xwe jı kijan zımani tê ez nızanım. Dıbe ku jı "küfe" ya (Tırki) tê. Lê dı Kurdi da, jê ra "zembil" tê gotın ku pıraniya gel dızane çı ye.

(11) "Dı vi navberê de dengê muzikeke xweş dıhat."

Jı ber ku peyva "navber" mê ye, dıvê dı şûna "vi" da "vê" bıhata nıvisandın. Dıbe ku xele-tiyeke tashihê be, jı ber ku paşpırtıka wê (ê) rast hatiye nıvisandın.

(12) "....... mantoyên mêran ji weke per û baskan perwaz dıdan."

Palto, qapût yan ji sako yê mêran nın. Lê manto tenê jın lı xwe dıkın.

(13) "Dans her û her dıgeriya û lı dora salonê çerx û vız dıbû...."

"Çerx bûn" jı "zıvırin" û "vegerin" ê ra sino-nim e. Lê "vız bûn", dı mena "dev jê berdan", "pışti neqedandın, yan ji, jı ber westandınê, dı kırına kareki da poşman bûn û nivçe hiştın" da tê gotın.

(14) "Wê çaxê keçıkê bı ken jê pırsi, ku gelo ew dıkare texmin bıke, ka ev çend swalên wi ne, ku ew lı koşkê ye. Pısmir lê vegerand û got, ku ew demeke ne hınde dırêj e, ku ez lı vır ım."

Dı hevoka yekemin da, sal "swal" hatiye

nıvisandın. Xeletiyeke tashihê ye.. Dı hevoka duwemin da, çewtiyeke rêzmani heye. Eger mebest raste-rast jı devê Pısmir dayina bersivê be, dıvê pışti "got" nişana { : } bête nıvisandın û gotınên wi dı nav {<< >>} bête nıvisandın. Hıngê {,} û {ku} radıbın.

(15) "..û dest pê kır berê xwe da ber bı bajêr." Lı vır, jı "berê xwe dayin"ê ra daçeka "ber bı" zêde ye.

## "Tûan"

(16) "Ew dıxwaze bêtır lı malê bımine, kuli û berazan nêçir bıke û bıgre" (rûp.8)

"Nêçir kırın" lı vır dı formeke cuda da hatiye xebıtandın, ku dı zımanê qısekırınê da wısa nayê gotın. "Bera (yan ji beri) kuli û berazan bıde û wan bıgre" yan ji "here nêçira kuli û berazan û wan bıgre" dıkare bête gotın, eger mırov bı temami gırêdayi zımanê qısekırınê bımine..

(17) "Gava çavên dapirê lı Tuan dıkevın, ew hema dı cih de jı koxa xwe derdıkeve, hembêza xwe vedıke û ber bı wi dıçe." (rûp. 11)

Daçek, peyvên pıçûk ın, lê rolên wan mezın ın. Lı vır, dı şûna "lı" da dıvê "bı" bıhata gotın. Çımki "çav lê ketın", meneyeke wê ya cuda heye, ku dı hevokê da mebest ne ew e.

(18) "Ûniformeke kesk e geleki nû lê ye." (rûp. 12)

Lı vır, lı dû peyva "kesk",dı şûna "a" da "e" (wek lêkera "bûn") hatiye nıvisandın...

(19) "Wi tıfınga xwe ji avêtiye ser mılê xwe." (rûp. 12)

Wi tıfınga xwe avêtiye mılê xwe, ne "ser" mılê xwe..

(20) "Dı warê bavê xwe de êdi hınde gelek tışt nayên bira Tuan." (rûp.12)

Peyva war, dı meneya konkret da, jı "cih", "şûna ku mırov lê dıji, lê dısıtıre", û "wargeh" ra sinonim e. Dı meneya asmani (abstrakt) da ji tê xebıtandın, lê jı bo kırınekê, fıkrekê, pêşeyeki.. ne jı bo tışt û heyiyên berbıçav, wek "bav". Mesele "dı warê bavtiyê da" mırov dıkare bêje. Dı hevoka jorê da "warê bavê" meneya konkret dıde ku mebest ji ne ev e.

(21) ".....Tuan ketiye ava wi çemi û tê de ajnê kıriye." (rûp.13)

"Ajnê" wek forma nominativ hatiye pejırandın, ku ne rast e. Dı ferhenga dawiya pırtûkê da ji "ajnê" hatiye nıvisandın. Lê halê netewandi "ajne" ye.

(22) "Ew wext e,.." "Waxtên berê,.." (rûp. 14)

Lı ciheki "wext", lı ciheki dın "waxt" nıvisandın, sergêjiyê peyda dıke. Xasıma dı eyni pırtûkê da, nıvisandına peyvekê, bı çend şêweyên cuda, pıçeki ji bêistikrariyê nişan dıde.

(23) "Ew dıvê here kêlikê xwe bıde ber sihê da ku xwe jı germê bıparêze. û here kêlikê xwe bıde ber sihê."

Diyar e ku xeletiyeke tashihê çêbûye. Hevok car û niveki hatiye nıvisandın. Lı aliyê dın, peyva "kêlik", dı xwendınê da wek "Kêlık" (kevırê serê gorê) tê fehmkırın jı ber ku ev peyv (kêlik) jı aliyê pır kesan va nayê zanin.

Eger yek jı sinonimên wek: bistekê, lehzekê, pıçekê, hınekê qasekê,xêlekê, demekê ku pıraniya xelkê mena wan dızanın, hatıbûya nıvisandın wê hêsantır bıbûya.

(24) "Tuan xwe bı meraq nêziki kuçık dıke"

"Hema wê çaxê ji kuçık xwe dırêji wi dıke"

".......gelo kuçıkê ew gırtiye çı kuçık e." (rûp. 18)

Dı hevokan da xeletiyeke ferhengi heye,ku dı şûna "kûçık" da "kuçık" hatiye nıvisandın. Dı hevoka pêşin da ji, pêwist e forma tewandi ango "kûçıkê" bête nıvisandın.

(25) "Diya Tuan, herçendi dıvê Tuan lı ba dapira xwe be ji, da ku ew hem fıravina xwe bıxwe û hem ji, pıçeki ji vehıse, dê sedi sed were malê." (rûp.18)

Ki dê sedi sed were malê? Bersiv baş zelal nine..

(26) "Dırûvên dinan lê dıçûn." (rûp. 21)

"Dırûv pê ketın", "dırûv dayin" heye, lê "dırûv lê çûn" ne rast e. Ango rastiya hevokê weha ye: "Dırûvên dinan pê dıket".

(27) "-Mın beri nıha çendeki bıhist, ku kuçıkeki har lı van deran lı çolê ketiye." (rûp.21)

" kuçıkeki har **lı** çolê ketiye" şaş e, rastiya wê: "kûçıkeki har **bı** çolê ketiye"

(28) "Mai jı kûçık kad dıke û doktor ji lı bırina piyê Tuan dınıhêre." (rûp.23)

Vê carê "kûçık" bı "û" rast hatiye nıvisandın. Lê pêwist e forma wê ya tewandi ango "kûçıkê" bıhata nıvisandın.

(29) "-Tuan, kuro dıvê tu bıji! dê bı ken pê jê re dıbêje" (rûp.26)

Dı hevokê da "pê" zêde ye. Xeletiyeke tashihê ye.

(30) "Mai tu caran xwe holê dılxweşê heyina Tuan, ê ku lı ba rûnışti, his nedıkır."

Eger em jı aliyê rêzmani va lê bınıhêrın, dıvê "dılxweşê" bıbe "dılxweşa", jı ber ku Mai jın e. Lê gelo pıçeki sıvıktır nabe, eger weha bête gotın:

"Mai tu caran xwe wek vê gavê bı heyina Tuan ê ku lı ba rûnışti, dılxweş his nedıkır."

## helbest

**Rızaliyê Reşit**

Lı ser mın esmanê sayi
destê mın dırêj,
Xwey mal ım, hal û avayi,
Dil û zûva dengbêj,
Herçiyê mın dıbinın dûrva,
Dıbên:-Xwezi lı te.
Ax! nızanın, weten dûrva
bırindar ım bo te.
Bırina mın kûr e, xeder,
lê mın heye guman,
her derdeki derman û sar,
bı xwe dıde zeman.
Û ez şa me bı vê dewranê
Weten gırtiye rıkêf,
lı ser dıka Kurdıstanê
kurdnasi tê bı kêf.

***

Mın sosınek di nava mêrga da,
tevi sosına xwe ra gul dıda.
Jı wan sosın e mêrga da geştır,
bin û bengzê wê hemûşka xweştır.
Çevê mın lê gırt, ez berbê lıviyam,
çûm ber sekınim û serda gıryam.
Ax! Ez metel mam ser stuyê wê xar,
keserek kete dılê mıni jar.
Mın go:- Sosına delale çev sût,
bejn bılınd û naz lı vır xût.
Lê gelo ka çi ye mena stuyê xar,
ku anim ber te kırım tengezar.
-Ê, go:- Şayirê bı hış û sewda,
te çıma kul û derdê mın tevda.
Xweş e ev mêrga, qet qusûr tune.
Çı bıkım yazıx* ne yêra** mın e.
Wi wextê qewxê***, ba û baranê,
ez avitım rast vê mêrga hanê,
Xwezi bıdima têli mıskenê mın,
Hêja bıdita teyê rengê mın,

23-03-1990

*: heyf
**: cih, war
***: şer û doz
(Nota RN.)

# Deranin

Deraninên (idiom) her zımaneki, pıri caran xwedi xusûsiyetên taybeti ne. Ew bı motifên netewi xemlandi ne û lı gor jiyan û serboriya wi mılleti hatıne afırandın.

Dı her zımaneki da rêyeke rawekırınê heye û ev rê lı gor serpêhatiya wê cıvatê, lı gor jiyan, urf û adet, çand û xusûsiyetên cûrbecûr tên xuyan. Jı ber vê yekê ji, jı ali deraninan va dı navbera zımanan da ferqiyên mezın hene. Gelê Kurd jı bo rawekırın û aşkerekırına bûyereki, rewşeki, merıveki û hwd. pıri caran bı deraninan an ji gotınên pêşiyan ditınên xwe xurt dıkın û rengê bûyerê rasterast dıdın nişandan. Mesela deranina **"bı soz û qırarê mêrê berê"** dılsozi û camêriya gelê Kurd tê aşkerekırın, ku ev rewş ji jiyana eşiri, tore û adetên kevn, pevgırêdana soz û bext û mêrxasiyê rawe dıke. Mesela Kurd, jı bo baraneke pır zêde deranina **"wek devê meşkê"** baran dıbare dıbêjın, bı vê naverokê, Tırk, deranina "bardaktan boşanırcasına", İngıliz "it is raining cats and dogs" (wek pısik û kûçıkan baran dıbare) dıbêjın. Her çıqas her sê deranin, dı eyni manê da hatıbın bı kar anin ji, lê lı gor xusûsiyetên zımanê xwe hatıne çê kırın.

Lê ev rewşa han her dem ne wısa ye, jı ber ku carna merıv nêzikayi û wekheviyê ji dı navbera deraninên zımanan da dıbine. Ev nêzikahi û wekhevi bı gelek awayan dıbe. Dı jiyana cıvaki da gelek rewşên wek hev an ji nêzi hev hene, ku her mıletek bı serê xwe deraninan çê dıke, lê jı ber gelek rewşên wek hev nêzikahi dı navbera zımanan da çê dıbe û pıri caran bêyi pêwendi yan ji dan û standınê gelek deranin dı eyni mane û formê da tê afırandın. Mesela dı Kurdi da jı bo hın kesên ku gotınên wan lı hev nanıhêre, lı rû bı awayeki bı dılê xwe bı awayeki dın ın, bı deranina "durû" tên bı nav kırın; kesên ku bırçiyê her tışti ne (wek mal û mılk, pere, xwarın û vexwarın) û tu car jı tıştêki têr nabın, bı deranina "çavbırçi" tên nasandın. Ev deraninên han, dı Tırki da bı deranina "ikiyüzlü" û "açgözlü", dı İngılizi da "two-faced..." tên rawekırın. Riya nêzikahiya deraninên navbera zımanan bı hınek awayên dın ji çê dıbın: Bı riya wergerandın, bı riya pêwendiyên kulturi (kulturên ku xısmi û nêzikahi dı navbera wan da hene), bı riya ol (mıletên ku xwedi eyni oli ne), pêwendiyên siyasi û wd.

***Deranin, jı bo rawekırına averûyan, jı bo rawekırına hest (his) û rewşên taybeti tên bı kar anin. Ew pıri caran jı çend gotınan pêk tên, û kêm caran ji bı yek gotıneki dıbın deranin.*** Mesela jı bo xeydan û dılmayinê "lêv kırın"; jı bo pêşandaneki ne rasterast "keça mın jı te ra dıbêm, bûka mın tu fam bıke"; eger merıv bı kar û şexsiyeta yeki ne bawer be deranina "merıv bı cêrê te nıkare here avê"; mêr an ji jınên ku zewıcandi be û lı dû yeki / yeka dın bıgere, bı deranina "çavlıder" tên rawekırın û hwd. Dı vi wari da merıv dıkare bı sedan nımûne bıbine.

Pıştı vê rawekırına kurt, em lı jêrê çend minakên "Deraninan" ku jı ali **A. Bazidi** hatıne berhevkırın, pêşkêşi xwendevanan dıkın û em hêvidar ın ku xwendevanên me ji bal bıkşinın ser babetên weha û jı me ra bınıvisın.

**Redaksiyona Roja Nû**

**Berevkar: A. Bazidi**

- Agır barandın
- Agır berdan
- Agırê kulê
- Agır pekandın
- Agır pêketın
- Aqıl jı seri çûn
- Av ronahi ye
- Ava bınê şerbıkê
- Ava seri germ kırın
- Bı dev dost, bı zık dıjmın
- Ber malê dınê ketın
- Berhev dan
- Berxê kêrê
- Berxê serê lodê
- Berê xwe da oxırê, pışta xwe da felekê
- Bext xwestın
- Bextê dê cıhêzê qizê ye
- Bı avê ra çûn
- Bı erda reş da çûyin

- Bı telaqê jın berdanê
- Bı soz û qırarê mêrê berê
- Bırindarê hefk gula
- Bımırım jı erdê ra, bımınım jı te ra me
- Bihn çıkandın
- Bihna diya tê jı xatiya
- Bıncıl kırın
- Bo xêrê nayê dêrê
- Bı gıli û gotın
- Bê gıli û gotın
- Ciyê ti û tune
- Çaxê hev bûn
- Çav badan
- Çav berdan
- Çavbırçi
- Çavê xwe gırt, devê xwe vekır
- Çav dı seri da sor bûn
- Çav lı malê dınê bûn
- Çav lı dınyayê bûn
- Çavsor bûn
- Çereza berika xortan
- Çok dan erdê
- Damarê namûsê
- Dara qetlê
- Dendıkê kulê
- Dest jê kışandın
- Dest jê şûştın
- Dev jê berdan
- Dev dıbê, dıl nabê
- Devken, dıl bı kul
- Dev şirin kırın
- Dıl çûyin
- Dıl kırın
- Dı xwe ra neditın
- Doxinsıst
- Du gotınê wi lı hev nanıhêre
- Durû
- Guh bırın
- Guh lê bel kırın
- Guh nedan
- Gurê dev bı xwin
- Gurê har
- Gurê Sıbatê
- Heft lengeri
- Pêsirtengi
- Hırçê bırindar
- Jı dest û pê ketın
- Jı rê derketın
- Kamçıki kırın
- Kayê dan ber bayê
- Kela dıl sar kırın
- Kerra bı guh kırın
- Kerê bı lıngê paşi gırêdayi
- Kodıka vala lı ya tıje xıstın
- Koremıjê ber çavan
- Kumê Elo lı serê Celo
- Kum danin seri
- Lêv kırın
- Lıng dan ser
- Mêrê kulê
- Mihê ber beranan
- Nano zıko
- Ne da û ne stand
- Pariyê şermê; loqa şermê
- Heft pehin lê xıstın
- Pey ketın
- Pê dan erdê; çok dan erdê
- Pêsirtengi lê çêbûn
- Pêşi zırav, dawi stûr
- Pıst gırêdan
- Pışta xwe dan
- Pozê xwe kırın her tışti
- Reng lê qelıbin
- Reşê şevê
- Roda çûn
- Roj lı ciyê teng çû ava
- Rû bı rû
- Lı rû sekının
- Rûyê xwe badan
- Serê xwe lı kevıra xıstın
- Şax vedan
- Şirhelal
- Şirheram
- Ter û teze mayin
- Tırsa mın jı wi tırsê ye
- Tırûş kırın
- Tûrık tıji bûn
- Xura dıl
- Xem xwarın
- Xwin berdan
- Xwin bı xwinê tê şûştın
- Qûş lê qetin
- Wek devê meşkê baran barin
- Zenga mırınê
- Zıkreş
- Zımandırêj; zımançepel

# BEREVOKA TERMAN

## HEYWANÊN GOŞTXUR

**Yên kûvi, beji, yan ji beyani:**

Şêr
Pılıng
Hırç
Kutık,kudık
Gur
Çêlegur
Dêlegur
Keftar
Rovi
Çeqel
Kurûbeşk, kurebeşk
Kûze
Gorewilk, gornepış

**Yên kedikıri**

Kûçık, se, seg
Dêlık, dêlese
Cewrık
Bonci
Taji
Pısik, kıtık

## HEYWANÊN GİHAXUR

**Yên kedikıri**

Çêlek, mange
Golık, parone
Nogın
Ga
Conega, conge
Boxe
Gamêş
Madak, caregize
Sak
Hesp
Mehin
Cani
Hêstır, qantır
Ker
Manker
Dehşık, kurik
Nêri
Bızın
Gisk
Tıştir
Hebûri
Berendur, berındir
Kar
Mih, mêşın
Beran
Hogeç
Kavır
Berx
Deve
Lok-deve
Fil
Beraz, xınzir, wehş

Dı hejmareke dın da navê kêzıkan..

**Yên beyani**

Gakûvi
Pezkûvi
Xezal
Axû
Berazê beyani
Fil

## HEYWANÊN KOJEK

Segav (seyê avê, sehkê avê)
Suhor, plûr, sımbolek
Jûji, jijo
Sixur
Kiroşk, Kêvrûşk, kewroşk, kerguh, kêrgu
Mışk

## HEYWANÊN KAŞOKE

Mar
Ziya
Marê Teyar
Koremar
Tiremar
Margêsın
Şamar
Marmarok
Gumgumok
Mazizerk, maqizer
Pıfa diya mar, balifa mar
Req
Kevjal, kevjıngal
Kûsi



# CIVİNA NIVİSKAR Û HUNERMENDÊN KURD

**Komiteyeke demi hat hılbıjartın bo ku erkê pêkanina cıvina mezın bine cih, da ku lı Elmanya Federal, Yekitiya Nıviskar û Hunermendên Kurd bête sazkırın.**

**"Dı dınıyayê de pır tışt bı lez û bez dıgûherın. Pêwist e nıviskar û hunermendên Kurd ji lı dervayi welat gavên pêş bavêjın, jı tengditınê xwe xılas bıkın."**

Lı Elmanyayê nıviskar û hunermendên Kurd dı rojên 30.11/02.12.1990'i da konferansek pêkanin. Dı vê cıvinê da gelek nıviskar, stranbêj, hunermendên şano û sinemayê beşdar bûn wek: E. Boyik, Şêrin, H. Habeş, H. Işık, T. Bayrak, Ferhad, A. Sipan, H. Şahin, H. Bektaş, V. Bazidi, R. Topal, A. İsmet, F. Ahmed, A. Çelik, H. Ulbeyi, K. Akan. Jı Kurdên Sovyetê nıviskar û helbestvan Eskerê Boyik ji tevi van xebatan bû. Nıviskar û hunermendên Kurd jı gelek aliyan va lı ser pırs û dıjwariyên lı pêş xwe ditınên xwe rave kırın.

Lı ser pêwistiya sazkırına komeleyeke demokratik jı bo nıviskar û hunermendên Kurd yên lı Elmanyayê, gışk dı eyni baweriyê da bûn. Bona vê ji, dı roja dawiya cıvinê da komiteyeke demi hat damezrandın, da ku ew jı bo amadekırına cıvineke mezıntır bıxebıte. Lı vır em cih dıdıne beyannama dawiya cıvinê.

## Beyannama dawiya cıvina nıviskarên Kurd

*Lı Elmanyayê nıviskar û hunermendên Kurd dı navbera 30.11./02.12.1990 de konferansek pêkanin. Jı kurdên Sovyetê nıviskar û helbestvan kek Eskerê Boyik ji beşdari konferansê bû.*

*Bê guman komeleyên demokratik dı warê civaki da, her dem jı bo me Kurdan pêwist bû, û herweha iro ji zor gıring ın. Bı vê birbaweriyê beşdarên konferansê, hozan, nıviskar hunermendên şano û sinemayê dı sê koman de derheqa pırs û pırsgırêkên pêşiya xwe danûstandın kırın. Roja sısiyan bı hev re cıvin çêkırın û gıhiştıne vê bıriyara jêrin:*

*Gelek problem lı pêşiya nıviskar û hunermendên Kurdan hene. Bı riya rêxıstınek demoqratik, ew kêm dıbın û dı demeke kurt de jı*

*holê radıbın. Bona bı cihanina wê armancê, pışkdarên konferansê baştır ditın ku komiteke demi jı nıviskar û hunermendên Kurd lı Elmanyayê hılbıjêrın. Ev komite dı wexteke nêzik de pêvendiyan lı gel hemû ronakbiran dayne û cıvina fireh amade bıke.*

*Pêvist e berê pêşin em bêjın ku, em gırêdayi tu partiyekê ninın. Em dıxwazın edebiyat çand û hunerên Kurdan bı rêxıstıni pêşve bıbın, xwe bı gelên cihanê dı vi wari de ji bıdın naskırın, yekiti û hevkariyê dı nav xwe de pêkbinın. Bı kurti, em dıxwazın bı rasti bıbın dengê gelê xwe.*

*Dı dıniyayê de pır tışt bı lez û bez dıgûherın. Pêvist e hunermendên Kurd ji lı dervayi welat gavên pêş bavêjın, jı tengditınê xwe xılas bıkın. Bı rêxıstıni lı gel hev, bı usûleke demoqratik û nûjen xebata xwe rêk û pêk bıkın.*

*Geli hevalên hunermend û nıviskar!*

*Eger em bı rasti kar bıkın, çı lı welat çı lı dervayi wi, berhemên me wê bı kêri xebata gelê me bê. Werın em wısa bıkın ku dı nav çand û hunermendiya cihanê da ciyê xwe yê rast bıgrın. Bıla yekitiya me, qelem û hunerên me yên dın bıbe çek û silahek lı dıji neyarên me, bıla bıbe baxça dostayeti û bırayetiyê dı nav cihanê de.*

*Wek em hemû dızanın bı yekiti û pıştgıriyê ve em dıkarın meselên xwe û yên gelê xwe çareser bıkın. Lı hêviya rexne û pêşniyarên we ne. Jı nuha ve spasiya we dıkın.*

KOMİTA AVAKIRINA YEKİTİYA NIVİSKAR Û HUNERMENDÊN KURD LI ELMANYA

Navnişan: A. ÇAMLIBEL
Schubert Str. 30
4600 Dortmund 1

□

# Lı ser "Jiyana Kurdan" Pêşangehek

**Ferhan / Hannover**

Dı rojên navbera 20.10-9.11.90'i da, lı Hannoverê bı amadekariya «Forma Dınya Sêwemin» lı ser «Jiyana Kurdan» pêşangehek hat vekırın. Pêşangeh dı bın parastına wezira Edaletê ya Niedersachsen Heidi Alm-Merk da pêkhat.

Vekırına pêşangehê bı axaftına Heidi Alm-Merk dest pê kır. Alm-Merk dı axaftına xwe da lı ser kriza xelicê û doza gelê Kurd sekını û got ku eger lı herêmê şerek dest pê bıke, barê gıran yê vi şeri wê bıkeve ser pışta gelê Kurd. Jı ber vê yekê ji, divê mırov bı xurti lı dıji şereki weha raweste. Wê bal kışande ser pırbûna penaberên Kurd dı Eyaleta Niedersachsen da û lı ser vê yekê got: "Ez lı ser navê Hukumata Eyaletê, bı dıl û can lı van kesan sılav dıkım". Wê herwısa got ku ew amade ye ku bı hemû imkanên xwe pıştgıriyê bıde amadekarên vê pêşangehê.

Jı amadekarê pêşangehê, ango "Foruma Dınya Sêwemin" ji Walter Zuber qıse kır. Wi jı koalisiyona SPD'ê û Keskan ya Eyaleta Niedersachsen daxwaz kır ku, wek parçeki mafên mırovi mafê xwendına dersên zımanê zıkmaki derbasi jiyanê bıkın. Walter pêşniyaz kır weki pêwist e lı bajarê Hannover jan ji Celle'yê, wek model, dı dıbıstanekê da, -her kijan dıbıstan dıbe,- jı zarokên Kurd ra dersên zımanê Kurdi bên dayin. "-Jı ber ku dı vê eyaletê da 15 hezar Kurd dıjin." got.Walter dı gotara xwe da herwısa da xuyan ku hukumata Tırk hebûna Kurdan inkar dıke, çanda wan bı terora dewletê dıxe bınê zordestiyê, û zımanê Kurdi bı qanûnan qedexe dıke. Ev politika bêbext lı Elmanyayê ji tê meşandın. Lı dıbıstanan, dı şûna Kurdi da dersên zımanê Tırki dıdıne zarokên Kurdan. Wi weha gotara xwe domand: "-Bı vi awayi hukumata eyaletê, heta nıha pıştgırıya dewlata Tırk kıriye ku Kurdıstana Bakur koloni û bındest bıhêle."

**Tırkiya vê nıvisarê dı "Dengê KOMKAR", hejmar 128'an da hatiye weşandın.*

□

# Film:

Jı ber filma "Ez Hina Heme" (Es Gibt Mich Noch)

## *Xelata taybeti ya "Cıvis 90" gıhişte Welatparêza Kurd Senem'ê*




Gulçina Sisık / Elmanya

Ez Hina Heme (Es Gibt Mich Noch) Lı Elmanya Federal da isal xelata taybeti ya jûriyê *"Cıvis 90"* (Hemwelati 90) jı ber filma dokumenter dane mamostaya Kurd Senem'ê.

Bı navê, " Bı Biyaniyan ra Dan û Sıtandın" ev şabaş sê salan vırda ye tê dayin. Ev şabaş jı aliyê Yekitiya saziyên Radyo û televizyonên Elmanan hat dayin. Ev yekiti, jı qanala televizyon ARD, waqfa Freudenberg û Saziya peywendiyê bı biyaniyan ra, ya hukumeta Elman pêktê. Xelatên isal lı ser hev qasi 40 hezar mark e.

Armanca van xelatana, ev e ku, her cûre bernameyên radiyo û televizyonan yên ku dı navbera biyaniyan û elmanan da alikariya baş çêdıkın, bêtır bên teşwiq kırın.

Filma Ez Hina (hela hê) Heme, jı aliyê rejisor Klaus Antes, jı bo qanala televizyona WDR'ê hatıbû amadekırın. Par payizê meha Çıriya Pêşin, cara pêşin dı vê qanalê da hat nişandan. Heta isal du sê şabaşên mehelli ji wergırt.

Film, jı aliyê Senem'ê va hatiye leyistın. Pıştî Cunta faşi lı Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê, mamosta wek welatparêz û pêşverûyên dın tê gırtın. Pır işkence û tedayê lê dıkın, lê tu tışti jı dev nagrın. Ne tenê dı bın işkencan da dımine, herwısa ji dıbe şahıdê gelek işkencan û jı ber wan hovitiya hevalên xwe yên kût û seqet dıbine. Şahıdê şehid kırına hevalê xwe yê mamoste Metin Aksoy e ji. Bê tırs hım lı zindanê hım ji pıştı derketınê, hember hemû fêl û fortan dest jı şahıdiyê bernade. Gelek caran dıxwazın bıkujın, pır nerehet dıkın, ew ji mecbûr dımine jı welat derdıkeve tê Avrupayê. Nıha lı Elmanyayê dıji.

Endamê jûriyê Dr. Josef Eckhard weha dıbêje:

" Heke em bıxwazın dan û sıtandına nabeyna biyani û Elmanan pêşta bıçe, dıvê mırovên lı Tırkiyê dıjin ji wek insanên Elmani, xwediyê heq û azadiyên siyasi bın.

Ev film bı tundi û gırıngi dıde kıvşê ku, pêwist e, van daxwazên han tu caran em paşta nedın, nevêjıne pışt guhên xwe."

Jı par heta iro gelek rojnameyên Elmani lı ser filmê nıvisin, dı gel filmê rewşa kurdan ji her anine ser zıman.


7.12.1990

## HEFTEYA FİLMÊN KURDİ / Munih

Dı rojên 11-16'ê meha Mıjdarê1990 da, lı bajarê Munihê, bı navê "Hefteya Filmên Kurdi" hefteyek hat çêkırın. Dı vê hefteyê da, ku bı hevkariya Komela Karkerên Kurdıstan û Kulturladen hatıbû amadekırın, 8 film hatın raydan.

Hefteyeki lı ser hev, dı lokala Komela Karkerên Kurdıstan da û lı Kulturladen, filmên video yên 16 mm. hatın raydan. Dı van filman da, jı hemû parçên Kurdıstanê jiyana gelê me, rewşa siyasi û abori lı ber çavan dıhat raxıstın. Her roj dı navbera 40-70 kesi lı wan temaşe dıkır. Dı 13 û 14'ê meha 11'an da, H. Işık û H. Schlumberger û rejisor Ravin Asaf, Curd û Sepp Paradismussen qıse kırın û bersivên guhdaran dan. Herçend ji ev cara yekemin bû ku hefteyeke filmên kurdi çêbû, lê disan ji geleki bı serfırazi derbas bû, û tecruba me ji pê zêde bû. Cem (Jı Dengê KOMKAR, hej. 128)

# Pêkeni..



**Weris**

Hepsi (gırti) lı hevdu kom bûn û her kesi behsa diroka xwe dıkır, bê jı bo çı ketıne hepsê.

Yeki jı wan got:

- Ma ev hal e, jı bo qetek weris du sal ceza dane mın.

Yê dın lê vegerand û got:

- Malxırabo, lı ser sergo tıji werisê avêtınê ne, jı bo qetek weris ev cara yekem e ku ez dıbıhizım mıroveki du sal ceza danê.

Mêrık serê xwe xıst ber xwe û got:

- Na lo golıkek ji lı dû hebû...

**Eger mın zanıbûya..**

Mıroveki jı hevalê xwe ra got:

- Welleh ê ku çav bı rûyê te keve, wê rojê têr nan naxwe.

Hevalê wi lê vegerand û got:

- Eger mın zanıbûya rast e, mın ê her sıbeh lı deriyê we xısta.

**Erê tu ji..**

Ap jı bıraziyê xwe ra got:

- Ma ne şerm e jı te ra ku, tu bı qumarê dıleyızi?

Bıraziyê wi lê vegerand û got:

- Erê tu ji kufriya meke!

**Pez**

Nexweş: - Bı şev xewa mın nayê doktor.

Doktor: - Mın jı te ra gotıbû, dema dıkevi nav nıvinan bırek pez bine ber çavên xwe û wana bıjmêre. Wê çaxê xewa te wê bê.

Nexweş: - Çı bırek, çı du bır, çê sê bır... Ez hema dıjmêrım û dıjmêrım. Pêşiyê heta dehan dıjmêrım, paşê sed, paşê hezar, paşê deh hezar û sed hezar. Û paşê dıkevıme nav wan û bı hevrıngê yeko-yeko hıriya ser pışta wan dıbırım. Dû ra vê hıriyê dırêsım û dıkım qumaş. Dıfroşım, êdi hew xewa mın tê, bı serê te kım!



**Eger hebûya..**

Mêrık gazi kevaniya xwe kır û got: "Ma tu nabêji ka mêvanê me bı xwarın e, yan bê xwarın e?"

Yê mêvan lê vegerand û got:

"Spas, bı rasti mın xwariye û ez hatıme."

"Nexwe ka çayekê bo me çêke", jı kevaniyê ra got.

Kevaniyê got:

"Bı xwedê gaz dı papûrê da tune, lê, got, eger çay hebûya mın ê şekır jı cem ciranan bıaniya.

"BAVÊ ALAN
Leningrad



ZAROK

# Gur û Pirê

TOLSTOY
Wergerandın jı tırki: Azad Nûbar


Rojekê gureki bırçi, derketiye û jı xwe ra lı xwarınê geriyaye. Dema lı perê gund, dı ber xaniyeki ra derbas bûye, dengê gırina zarokeki bıhistiye. Pirejıneke jı lawıkê bıçûk ra gotiye:

<< Eger tu dengê xwe nebıri, ezê te bıdıme gureki, bıla jı xwe ra bıhere.>>

Gur hema dı cih da sekıniye. Lı ber wi xani, lı ser dêla xwe rûnıştiye û lı benda pirê sekıniye ku lawık bıdê, û ew ji bıhere.

Bûye êvar, gur hê ji lı wır, bı hêviya standına zarokê sekıniye. Pıştî demekê dengê pirê bıhistiye:

<<Na berxê mın, êdi megri ez te nadıme gur-mura. De bıla ew gurê pir were vıra, em ê derhal wi bıkujın. Gur zûkava jı wê derê rabûye û bı xwe jı xwe ra :



<< Bı van mırovan ji qet baweri nabe. Gotıneke wan ya dın nagre.>> gotiye.

Paşê hêdi hêdi jı gund dûrketiye û çûye.

# Şıvanê Derewkar



Şıvanê bıçûk rojekê, dema lı çolê lı ber pez bûye, dıke qêrin û dıbêje:

<< Hawar! hawar! zû werın, gur hat!>>

Şıvanên dın bı lez xwe pê ra dıgihinın. Tên dınıhêrın ku gurê çı, halê çi... lawık derewan dıke.

Lawık çend caran ev tıştê han kır, herkes hate hawara wi.


Lê rojekê jı rojan, bı rasti ji gurek hat. Lawık disan:

<< Hawar! hawar! zû xwe bıgıhinın gur hat!>> kır qêrin. Lê mıxabın vê carê, tu kes nehate hawara wi. Çımki êdi pê bawer nedıkırın.

Gur ji dit ku, kesê ew jê bıtırse tune, hema kete nav pez û yeko-yeko ew xwarın.

**We dızanıbû?**

## Hesp tu wextê dırêjkıri xew nake



Gelek gundi û cotkar hene ku, dı jiyana xwe da, bı dırêjaya salan hesp xwedi kırıne, lê disan ji iddia dıkın ku hiç wextekê neditıne, ku hespek dırêjkıri xew kıriye.

Ma qey hesp ranazên?

Belê, lê ew lı ser piyan dısekının û radızên. Cani û hespên cıwan dıkarın xwe dırêj bıkın, lê hespên qert razana lı ser piyan tercih dıkın.

Gelo ew çawan nakevın, wexta ku lı ser piyan radızên? Jı dıbıstana Veterineriyê ya Bılınd (lı Swêdê), profesor Bengt Andersson weha şırove dıke: Hesp wexta radızê, bı alikariya reh û tamarên lıvinê, kasıkên çokên xwe yên paşiyê bı jor va dıkışine , da ku ew bı şev kılitkıri bıminın. Hıngê çokên pêşiyê ji jı xwe berê va, ango bı saya refleksên sinirê va tên gırêdan û kılitkırın.

Lê gelo ew weha rehet dıkın, qet nawestın? Na, ne hesp. Wısan tê bawer kırın ku, jı bo hespan xewkırına bı vi awayi xweştır e, jı ber ku, jı nû va rabûna ser piyan geleki dıjwar e bo hespê ku wextekê,carekê xwe lı erdê velezandıbe. Emrê (temen) hespê çıqas mezın dıbe, rabûn û raketına wan ji ewqas dıjwar û zor dıbe- çımki gelek caran bı hespên pir ra romatizma heye.

Dema çêlekeke (mange) mexelhati dıxwaze rabe ser xwe, pêşiyê radıbe ser piyên paşiyê, pıçeki dısekıne dû ra hêzdıde xwe û radıba ser çar piyên xwe. Lê hesp wılo nake. Ew berê radıbe ser piyên pêşiyê , dû ra, bı dıjwariyeke geleki mezın paşiya xwe ya gıran radıke.

Carna mırov dı hın wêneyan (resman) da, hespên lı erdê rûnışti dıbine. Lê ew fotografana, hıngê, dema ku hespê careke dın hêz daye xwe ku rabe ser piyan, hatıne kışandın.

*(Fantasi och Fakta)*

# Daxuyani jı bo Pressê:

*Dadgehên Kolonyalistan bı cezayên gıran dıxwazın pêşiyê lı çapgeriya Kurdi bıgrın.*

*Dı rojên çûyi da Mehkema DG.ya Ankarê dı derheqa xwedi û berpırsiyarê kovara Özgür Gelecek da, DGM ya İstenbolê ji dı derheqa berpırsiyarê kovara DENG da bıryara cezakırnê da.*

*Xwediyê kovara Özgür Gelecek Mehmet Bayrak bı 6 sal û 3 mehan, berpırsiyarê kovarê Bekir KESEN ji bı 15 milyoni hate ceza kırın. Lê ev ceza tenê jı ber yek dawayeki ye û ew ji jı ber nameyeke xwendevaneki ye. Lı dıji kovara Özgür Gelecek 30 dawayên dın hatıne vekırın û ew ji nıha berdewam dıkın.*

*Özgür Gelecek dı sala 1988 da dest bı jiyana weşanê kıri bû. Kovarek mehi bû û 8 hejmar der çûn. Dı hejmara yêkem da tirên dewleta Tırk kışand ser xwe. Hemû hêjmarên wê pışti ku jı çapxanê derket jı aliyê polisan va hatıne komkırın û belavkırına wan hate qedexekırın. Xwedi û berpırsiyarên wê gelek caran hatıne gırtın û işkence kırın.*

*Me dı sala 1989'an meha Avrilê da lı ser vê yekê belavokek derxıstibû û zordestiya lı ser kovarê dabû xûyakırın. Dı wê demêda TV Swêd ji bı M. Bayrak ra hevpeyvinek çêkır.*

*Pışti gelek êriş û tadeyên hukumatê û problemên abori, kovarê nekari jiyana xwe bıdomine, hate gırtın.*

*Jı ber ku ew kovar jı aliyê kurdan va dıhate derxıstın û rûpelên xwe jı pırsa kurdi ra vekıri bû û teror û kırınên dewleta Tırk lı ser gelê Kurd rexne û aşkere dıkır.*

*Kovara DENG ji kovareke Kurdi ye û jı hêjmara pêşin vırda zordari û zulma dewletê lı ser kovarê kêm nebû. İro dadgehên DGM jı bo xwedi û berpırsiyarên kovara DENG gelek dawa vekırıne û jı vana yek tenê kuta bûye. Berpırsiyarê kovarê Kamil Ermiş bı 6 sal û 3 mehan û Mehkema Asliyeyê ya 2. a İstenbolê ji lı ser hev jı bo çar dawan çar (4) sal ceza dan, dûra ew çar salana vegerandın cezayê peran. Lı ser hev 267 sal ceza tê xwestın jı boy xwedi û berpırsiyarên wê.*

*Mehkema Asliye Cezayê ya 2. a İstenbolê dı bıryara xwe da weha dıbêje:*

*".. Dı rûpelên 73 û 78 yên kovara DENG (hejmar 4) da û dı rûpelên 43 û 49 (yên hejmara 3 'an) da dersên zımanê Kurdi tên dayin, bı Kurdi şıêr hatıne nıvisandın, notayên muzika Kurdi tên fêrkırın. Ev kıryara han, xên jı zımanê resmi ê Komara Tırkiyê, bıkaranin û hinkrına zımaneki zıkmaki yê dın ango Kurdi tê cehd kırın. Û berpırsiyarê kovarê dı ifada xwe da dıbêje ku zımanê wi ê zıkmaki Kurdi ye, û ew nayê qedexekırın, û wê bı vi awayi xebata xwe ya weşanê bıdomine. Mehkeme gıhişte wê bıryarê ku lı gor qanûna 2932, benda 3'an, ev faaliyet sûc e, çımki xênjı Tırki, bı karanin û belavkırına zımaneki zıkmaki yê dın (Kurdi) hatiye kırın. (...)"*

*Ev rûreşiya han lı hember çapgeriya Kurdi geleki kevn e. Lı ser çapgeriya Kurdi zordari û teda tu wextekê ranebûye.*

*Lê pışti ku cunta faşist hukum xıste destê xwe, barbariya lı ser gelê Kurd, zıman û çanda Kurd gıhişte dereca dawin.*

*Lê dı bın serokatiya Özal da ji ew zordesti berdevam e.*

*Lı Tırkiyê bı zmanê Kurdi nıvisandın rojname û pırtûk derxıstın qedexe ye. Yên ku kar û barên çapgeriya Kurdi va mıjûl dıbın, dıvê işkence, lêdan û hepsê bıgrın ber çavê xwe.*

*Dewleta Tırk hewıl dıde ku bı navê Kurd û Kurdıstanê tu deng dernekeve û tu tışt lı ser wan neyê nıvisandın.*

*Jı ber vê yekê ye ku kesên ku lı ser pırsa Kurdi dıxebıtın jı politika dewletê ra seri danaynin bı hışki tên cezakırın.*

*Dı van salên dawin da gelek dawa jı lı dıji weşanan hatine vekırın. İro ji gelek nıviskar, rojnamevan û berpırsiyarên kovarên Tırk û Kurd jı ber bir û baveriyên xwe dı zindanan da ne.*

*Em van kıryarên hukumata Tırk lı ser çapemeniya Kurd protesto dıkın.*


*Em jı hemû kes û rêxıstınên demoqratik û jı çapgeriyê dıxwazın ku lı hember zordestiya dewleta Tırk derkevın û pıştgıriya kovara Deng û Özgür Gelecek bıkın.*

*Jı Weşanên Kurdi ra azadi!*

*27.12.1990*

***Weşanxana Roja Nû***

# WEŞANEN NÛ










## Diroka Kurd û Kurdıstanê

*Prtûka dersê*
*jı bo pêngavên navin û bılınd*

-Amed Tigris û Aso Germiyani

*Weşanên Apec-Tryck och Förlag. Stıckholm.*

Diroka Kurd û Kurdıstanê pırtûka dersê ye. Ew dê dı dıbıstanên Swêdê da, dı dersên zımanê kurdi da, jı bo sınıfên 6-7-8 û 9'an da dê bête karanin.



Babetên pırtûkê, jı şarıstaniya Mezopotamyayê dest pê dıke û heta dema nıha tê. Dı destpêka her babetê da cih dane gotınên gıran yên ku dı babetan da derbas dıbın. Dı dawiya her babetê da ji, pırs hene. Pırtûk bı nexşeyên (xarite) Kurdıstanê û wêneyên diroki hatiye xemılandın.

Pırtûk bı metodên pedagojik ên modern hatiye amadekırın. Hevok kurt ın. Zıman sıvık e. Tip gırın.

Bıhayê pırtûkê 40 kronê swêdi ye. Adrêsa xwestınê ev e:

**APEC-Tryck och Förlag**
**Box 33 18, 163 03 Spånga- Sweden**

## Mıhemed Arıfê Cıziri Kewê Rıbad e.- Segvan Abdulhekim

*Weşanên Apec-Tryck och Förlag, 70 rûpel.*



Segvan Abdulhekim, dı vê pırtûkê da lı ser jiyana stranbêjê mezın Mıhemed Arıfê Cıziri; lı ser stranbêji û hunermediya wi dınıvise. Abdulhekim, baqek jı stranên ku Cıziri dıgotın dı pırtûkê da berhev kırne û cih daye ditınên hın kesên stranbêj û hunermend ku derbari Cıziri da gotıne.
Pırtûk jı tipên erebi, jı aliyê Serbest ZAXOYİ ve hatiye wergerandın. Zaxoyi, lı dawiya pırtûkê ferhengokek ji daniye.



*BERMAYÎYEKE DÎROKÎ:* **Dêra Zaferan:** *Ev avayî 1500 sal berî niha (495' an da) bûye der, lê berîya we ew îbadetgeheke agirperestan bûye. Ew yek ji avayîyên herî kevn e li Kurdistanê. Der nêzîkî bajarê Mêrdînê ye. Di hemû êrişên farisan û moxolan (Têmûr Leng) da, ew hatîye talan kirin, lê nehatîye herifandin. Îro jî bi hemû heybet û spehîtîya xwe li ser pîyan e. Niha wek dêra Suryanîyan tê bi karanîn.*

BIHA: 10 Skr